**Migrationsamt**
Fachstelle Integration

Thurgau



# Hun bi xêr hatin Kantona Thurgauyê!

## Zaniyarî ji bo kesên nû hatîn

**Desteya nivîskaran**

Çapa 2021ê

Ev belavok bi zimanê

- ▶ Albanî
- ▶ Erebî
- ▶ Darî/ Farsî
- ▶ Elmanî
- ▶ Inglîzî
- ▶ Îtalî
- ▶ **Kurmancî**
- ▶ Polonî
- ▶ Portuxalî
- ▶ Romanî
- ▶ Serbokroatî
- ▶ Slovakî
- ▶ Ispanî
- ▶ Tigrîniya
- ▶ Hingarî

SCAN ME

li ser malpera www.migrationsamt.tg.ch/integration
ji bo daxistinê li ber dest e.



**Hun bi xêr hatin**

Em gelekî kêfxweş in, ku te mala xwe veguhastiye Kantona Thurgauyê.

Tu di Kantoneke dînamîk de bi cihwar dibî, ku ji aliyekî ve vekirî ye, lê hima ji aliyekî din ve jî girêdayî dezgeh û kelepûrê xwe ye. Siruşta wê ya xwezayî, cihê wê yê herî baş li ser qeraxên gola Bodensee, aboriya wê ya di beşên corbecor de çalak û peywendiyên wê yên xurt bi Kantonên derdor re, Schaffhausen, Zürich û St. Gallen re û her wiha bi Welatên nêzîk re, mîna Elmaniya û Nemsa re, dihêlin ku Thurgau bibe cihekî dilrevîn û serincrakêş, hem ji bo jiyanê û hem ji bo lê karkirinê. Em hêvî dikin, ku tu û malbata xwe zû hest bi başî û xweşiyê li Kantona me ya delal bikin. Jiyana civakî û komele û dezgehên vê derê rengareng in. Em te ji dil û can dawet dikin, ku tevlî wan bibî.

Em gelekî pê kêfxweş in, ku komên miletên corbecor baş bi hev dikin. Thurgau Kantoneke aram e, ku tê de nifş û kultur û bîr û behweriyên corbecor bi rêzdarî bi hev re didin û distînin. Bê gûman ev yek ne ji ber xwe peyda dibe, lê belê pêdivî bi alîkariya herdu aliyan e. Ji hemiyan tê xwestin, ku di danûstandinên xwe de bi hev re dilfereh û lihevbihwêr bin – ev nirxên bingehîn in yên Welat û Civaka me.

Tu dê di vê belavokê de gelek zaniyariyan li ser jiyan û xizmetgûzariyên li Kantona me peyda bikî.

Xwe fêrî zimanê herêmî bike! Ew dibe kilîta serxwebûn û serbestiya te. Em her wiha ji te daxwaz dikin, ku tu destê pêkvejiyanê bi xelkên xwecih yê Thurgauyê re dirêj bikî. Ew danûstandinên te bi wan re, wê alîkariya te bikin, ku tu bikaribî derdora xwe baştir fahm bikî, zû xwe biguncînî û hest bi xweşiyê bikî.

Em ji dil û can bi xêrhatina te dikin û hêvî dikin, ku tu gelek tiştên nû ji xwe re peyda bikî û gelek danûstandinê balkêş encam bidî.

Cornelia Komposch

Seroka Herêmê
Beşê Dadweriyê û Asayîşê

# Naverok

**Pêkevjiyana li Thurgauyê .......... 6**
Kanton, Herêm, Navçe
Ziman
Hevguncîn
Nişteciyên biyanî
Siyaseta hevguncînê
Zaniyarî li her derê

**Hatina bo Kantonê .......... 8**
Lîsteya kontrolê piştî hatinê

**Maf û erk .......... 10**
Nirxên bingehîn
Serfirazî
Maf û erk
Sînordarkirina mafan
Mercên di warê ziman de

**Danûstandin .......... 12**
Fêrbûna zimanê elmanî
Fêrbûna zimanê elmaniya siwêsrî
Wergeriya pirçandî
Pirtûkxaneya pirçandî

**Niştecîbûn .......... 14**
Peydakirina malekê
Tamîna nava malê û tamîna li dijî berpirsiyariyê
Baca radyo û televiziyonê
Jiyana di xaniyekî kirê de

**Hatûçûn .......... 16**
Terembêl
Anîna terembêlên taybet ji derve
Veguherandina mohleta hajotinê
Hatûçûna giştî
Biskilêt û peyada

**Kar .......... 18**
Peydakirina karekî
Dahat
Parastina ji bidawîanîna kar
Bac
Navkokî li ser cihê kar
Tunebûna-cêwazkariyê
Karê bi reşî

**Pêşgîrî/ Tamînên civakî .......... 21**
Tamîna li dijî bêkariyê
Alîkariya civakî
Pereyên pêdivî
Pêşgîrî: stûna 1ê
Pêşgîrî: stûna 2ê
Pêşgîrî: stûna 3ê

**Tendirustî .......... 24**
Tamîna ji nexweşiyê û rûdanan
Bijîşk
Piştevaniya tendirustiyê û pêşlêgirî
Rewşên hawariya tendirustî
Guhdana dinanan
Pîrejin û pîremêrên kêmendam

**Zewac û malbat .......... 28**
Zewac û anîna malbatê
Hevjîniya tomarkirî
Zewaca bi darê zorê
Çêkirina zarokan û agahdariyên li ser cins
Ducanî û jidayikbûn
Bîhnvedana dayikbûnê û qerebûkirina wê

Pereyên zêde ji bo malbatan
Mafên zarok û gencan
Pirsgirêkên hevjîn û malbatan
Zordariya li nava malê de

**Perwerdekirin/dema icbarî ya çûna dibistanê ........................................................................33**
Dibistana gel
Belavok: „Derfetên xwendinê li Kantona Thurgauyê”
Berpirsiyariya dayik û bavan
Guhdana zarokan di ser guhdana malbatê û ya dibistanê re
Zarokên xwedan zimanên biyanî
Baxçê zarokan (ji temenê 4 saliyê de)
Dibistana seratayî (ji temenê 6 saliyê de)
Dibistana navendî I (ji temenê 12 saliyê de)

**Hilbijartina pîşe/xizmetgûzariyên demikî .......36**
Şêwirdariya li ser pîşe û xwendina zankoyî
BIZplus piştevaniya pêşkêşkirina daxwaznameyên kar
Xizmetgûzariyên demikî
Kursên hevguncînê
Pêşniyariyên xwendina pîşeyî yên nizim

**Xwendina pîşeyî/dibistanên bilind......................38**
Xwendina bingehîn ya pîşeyî (ji temenê 15 saliyê de)
Bakaloriya pîşeyî
Dibistanên navendî (ji temenê 15 saliyê de)
Dibistanên bakaloriya yên Thurgauyî-Schaffhauserî ji bo mezinan

**Xwendina pîşeyî ya bilind/Zanîngeh/ Berdewamiya xwendinê..........................................40**
Xwendina pîşeyî ya bilind
Zanîngeh
Pereyên xwendin û karê pîşeyî
Nasandina dîplom û xwendina zankoyî
Berdewamiya xwendinê ji bo mezinan

**Parastina jîngehê........................................................42**
Guhdana sirûştê
Rêzlêgirtina li cihên giştî
Komkirina qirêj û bermayan
Veçêkirina bermayan
Bermayên, ku nayên veçêkirin

**Jiyana civakî û komele..............................................44**
Kultur
Werziş
Geriyan, hajotina biskilêt, xûşandina li ser skatê
Komele
Bizava xêrxwaziya giştî
Dîn

**Tevlîbûna jiyana siyasî ..............................................48**
Demokrasiya rasterast
Dezgehên siyasî
Sê astên siyasî
Mafên siyasî yên kesên biyanî
Şêweyên din yên tevlîbûna siyasî
Hevwelatîbûn

**Navnûnîşanên sûdmend..........................................51**

## Kanton, Herêm, Navçe

Thurgau yek ji 26 Kantonên Yekîtiya Siwêsra ye (Çapa 2020an). Nêzîkî 282.000 nişteciyên wê hene (Çapa 2020an), ku li ser pênc Herêman û 80 navçeyan têne dabeşkirin. Paytexta wê Frauenheld e, ku xwedî 25.800 niştecî ye (Çapa 2020an).

## Ziman

Li Siwêsrayê çar zimanên fermî hene: elmanî, ferensî, îtalî û rêtoromanî. Kantona Thurgauyê girêdayî Siwêsraya elmanîziman e. Li Siwêsraya elmanî zimanê elmanî yê standard wek zimanê fermî û zimanê nivîskî tê bikaranîn. Di jiyana rojane de xelk bi zimanê elmaniya siwêsrî diaxivin. Li Siwêsraya elmanî gelek devokên elmaniya siwêsrî hene, ku hindek caran jî ferhengên wan, anku gotinên wan jî ji hev cuda ne.

## Hevguncîn

Hevguncîn pêvajoyeke hevbeş e, ku li ser bingeha maf û erkên destûra federal hatiye avakirin. Armanc jî ew e, ku hemî niştecî tevlî jiyana aborî û civakî bibin. Piştevaniya hevguncînê behra bihtir li ser pirinsîbê „piştevanî û daxwazkirinê” hatiye avakirin û di çarçoveya wê de bi taybet alîkarî ji bo fêrbûna ziman, pêşdeçûna karê pîşeyî û tevlîbûna civakî tê kirin.

- www.tg.ch
- www.thurgau-bodensee.ch





**Nişteciyên biyanî**

Hijmara kesên ji netewên biyanî li Kantona Thurgauyê dike 25.2 %. Nişteciyên biyanî ji 140 Welatan e, behra bihtir ji Europayê ne (94 %), 72 % ji Yekîtiya Europayê (EU) ne (Çapa dawiya sala 2020an).

**Siyaseta hevguncînê**

Rêvebiriyên fermî yên Thurgauyê ji bo piştevaniya pêkvejiyanê siyaseteke çalak ji bo hevguncînê birêve dibin. Hijmareke mezin ji navçeyên Thurgauyê girêdayî navendên pisporî yên herêmî ji bo hevguncînê ne. Ev navendên pisporî li ser mijarên fêrbûna ziman û hevguncîna pîşeyî û civakî şêwirdariyê didin koçberan. Ew hem şêwirdariya xelkê ji bo mijara cêwazkariyê jî dikin.

**Zaniyarî li her derê**

- [3] Navenda pisporî ya hevguncînê li Herêma Frauenfeldê
- [4] Navenda pisporî ya hevguncînê li Herêma Kreuzlingenê
- [5] Navenda pisporî ya hevguncînê li Herêma Weinfeldenê
- [6] Navenda pisporî ya hevguncînê li Oberthurgauyê
- [7] Beşê pisporî ji bo hevguncînê li Romanshornê
- [8] Beşê pisporî ji bo hevguncînê li Amriswilê
- [9] Beşê pisporî ji bo hevguncînê li Arbonê

- www.migraweb.ch
- www.ch.ch



**Heger tu li dema niştecîbûna xwe li Siwêsrayê kar bikî yan heger tu bihtir ji sê mehan li Siwêsrayê bimînî, wî çaxî pêdiviya te bi destûrnameyeke niştecîbûnê heye. Divê tu daxwaznameya xwe ya nivîskî li ba rêvebiriyên xizmetgûzariyên niştecîyan yên berpirsê herêma xwe pêşkêş bikî.**



## Lîsteya kontrolê piştî hatinê

**Yekser piştî hatinê**

- ❑ Navê xwe li ba rêvebiriya niştecîyan tomar bike (di navbera 14 rojan de)
- ❑ Gumrika milk û malê te bi xwe re anî bide
- ❑ Zarokên xwe li dibistana gel tomar bike
- ❑ Tamîna nexweşiyê û rûdanan ji xwe re girê bide
- ❑ Hisabekî li ba bankê û postê ji xwe re veke
- ❑ Navê xwe li kursê fêrbûna zimanê elmanî binivîsîne

**Di navbera çend mehên pêşî de**

- ❑ Belgeya çêkirina tamîna nexweşiyê ji rêvebiriya niştecîyan re bişîne
- ❑ Mafê wergirtina alîkariya diravî ji bo zarokên li dervey Welat dijîn serrast bike
- ❑ Telefûn, tv, înternêt û telefûna xwe ya mobaylê tomar bike

**Di navbera salekê de**

- ❑ Mohleta xwe ya hajotinê biguherîne
- ❑ Tamînê ji terembêla xwe re çêbike
- ❑ Terembêla xwe kontrol bike
- ❑ Hijmara terembêla xwe biguherîne

**Pêşniyar**

- ❑ Tamîna tiştên nava malê çêbike
- ❑ Tamîna taybet li dijî berpirsiyariyê çêbike
- ❑ Tamîna parastina yasayî çêbike
- ❑ Mafê xwe ji bo erzankirina mesrefan serrast bike
- ❑ Zaniyariyan ji xwe re ji ba navçeya xwe li ser çalakiyên werzişî û kulturî bîne

## Nirxên bingehîn

Yek ji armancên serekî yê Kantonê piştevaniya xweşiya civakê û geşbûna şexsî ya mirovan e. Ew bi taybet dabîn dike, ku mafê rewa, nirxên bingehîn yên destûra federal û asayîş û aramiya giştî bêne parastin. Kanton dikare tenê hingî desttêwerdanê bike, heger ji aliyê destûrî yan yasayî ve ew maf wergirtibe. Ew li gorî pirînsba dabeşkirina desthilatan hatiye birêxistin kirin.

## Serfirazî

Gel serfiraz e. Ew desthilata xwe hem rasterast bikar tîne, dema ku dengê xwe li ser destûra Welat yan li ser qanûnan dide, û hem bi rengekî ne rasterast di rêya wan Rêvebiriyên Dewletê re, ku wî hilbijartine. Gelê xwedan mafê dengdanê Rêvebiriyên Navçeyan, Desthilatên Kantonan (Encûmena desthilatdar), parlementoyê Kantonê (Encûmena mezin) û nûnerên Thurgauyê ji bo Encûmenên Yekîtiyê hildibijêre.

## Maf û erk

Her kesekî/keseke, ku li Kantonê dijî divê erkên xwe yên destûrî û qanûnî bi cih bîne: divê bacên xwe bide, zarokên xwe bişîne dibistanê û her wekî din. Û di heman demê de mafên bingehîn yên dîmokratîk ji hemî nişteciyan re misogir in, wek mafê selametiya can û beden, wekheviya di navbera jin û mêr de, mafê tunebûna cêwazkariyê, mafê zewacê û her wiha mafê azadiya bîr û

**Destûra Kantona Thurgauyê û qanûnên kantonî:**
► www.rechtsbuch.tg.ch

**Qanûnên Federal:**
► www.fedlex.admin.ch




boçûnê û behweriyê.

**Sînordarkirina mafan**

Mafên bingehîn ne hemdemî ne. Kanton dikare wan sînordar bike, taku emniyet û rêkûpêkî û berjewendiyên giştî biparêze. Azadiyên takekesane hingî li wê derê bi dawî dibin, li wî cihê ku azadiyên mirovên din dest pê dikin. Wek mînak tu kes nikare xwe bispêre azadiya behweriyê, taku qanûnên dibistanê bi cih neyne. Azadiya derbirîna bîr û boçûnan maf nade kesekî, ku gotinên bêrêz ji kesekî din re yan ji komeke din re bêje.

**Mercên di warê ziman de**
► [1]

Qanûna biyaniyan û hevguncînê (AIG) şert û mercên astê zanebûna ziman ji bo qebûlkirina dayîna destûrnameya niştecîbûnê (B) destnîşan dike. Rêvebiriya Koçberiyê li dema qebûlkirina dirêjkirina destûrnameya niştecîbûnê, astê hevguncîna hevwelatiyên Welatên sêyem, anku Welatên biyanî, kontrol dike. Her wekî din jî li dema hebûna kêmasiyên di warê hevguncînê de, qanûna biyaniyan û hevguncînê (AIG) derfetê dide, ku rêvebiriyên berpirsiyar destûrnameya niştecîbûnê ya hemdemî (C) red bikin.



**Tu dikarî lîsteyeke berhevkirî li ser pêşniyarên corbecor yê kursên fêrbûna zimanê elmanî û hem li ser navendên ezmûna zimanê elmanî li Kantona Thurgauyê û li derdora wê li ser vê malperê peyda bikî:**
**▶www.migrationsamt.tg.ch/integration**

## Fêrbûna zimanê elmanî

Giring e, ku mirov xwe fêrî zimanê elmanî bike, taku mirov bikaribe bi serbestî û serbixwe li Thurgauyê tevbigere. Zimanê elmanî dê alîkariya te bike, taku tu karibî bi cîranên xwe re, bi mamosteyên zarokên xwe re, bi Rêvebiriyên Dewletê re û kesên din re bidî û bistînî.

Li Kantona Thurgauyê saziyên alîkariyê, komele û dibistanên corbecor kursên fêrbûna zimanê elmanî pêşkêşî xelkên xwedan zimanên biyanî dikin.

## Fêrbûna zimanê elmaniya siwêsrî

▶[3], [10]

Mirov behra bihtir di rêya danûstandinê bi kesên din re fêrî wan zimanan dibe, yên ku rojane têne axaftin, wek mîna devokan. Dibe ku mirov gelek sûdê ji fêrbûna devokekî bike, nexasim ji bo kar û pîşe. Kursên fêrbûna zimanê elmaniya siwêsrî jî hene, wek mînak li ba navenda pisporî ji bo hevguncînê li Frauenfeldê yan li ba dibistana „Klubschule Mirgos“.




**Wergeriya pirçandî**
► www.arge.ch
► [11]

Hindek rewşên taybet hene, baştir e, ku koçberên bi zimanê elmanî nizanin, alîkariyê di wan waran de ji wergerên pirçandî bistînin. Ev werger hatine fêrkirin, ku bibin piştevan ji bo têgehiştina dualî, rê li ber peydabûna navkokiyan bigirin û alîkariya koçberan bikin, taku bi derdora xwe ya nû re biguncin.

Xizmetgûzariya niştimanî ji bo wergerandina li ser telefûnê 0842 442 442 şev û roj heye û di navbera çend xulekan de wergerekî pispor ji bo bihtir 50 zimanan li ser telefûnê peyda dike.

Em qet piştgîriya wê yekê nakin, ku bihêlin zarok karê wergeriyê bikin.

**Pirtûkxaneya pirçandî**
► [12]

Komeleya pirtûkxaneya kulturan (VBdK) di rêya piştgîriya zanenbûna xwendin û axaftina wan mirovan, yên ku bi du zimanan yan bihtir ji du zimanan mezin dibin, alîkariyeke baş ji bo hevguncînê dike. Wekî din jî ew ji bo mirovên hemî zimanan cihekî hevdîtinê ye û di rêya ahengên rengareng de dibe alîkar ji bo danûstandina di navbera çandên corbecor de. Pirtûk û berhemên pirtûkxaneya kulturan beşek e ji pirtûkxaneya Kantona Thurgauyê.





### Peydakirina malekê

Tu dikarî malên kirê di reklamên rojnameyan de, di înternêtê de û di rêya nivîsîngehên simsarên malan re peyda bikî. Taku tu bikaribî girêbesteke kirêkirinê ji xwe re bistînî, divê tu pirsnameyeke tomarkirinê tijî bikî û divê tu hindek belgeyên taybet radestî rêvebiriya malan bikî, wek mînak belgeyekê li ser deynan (▶www.betreibungsamt.tg.ch), belgeya dahatê yan girêbesta kar.

### Tamîna nava malê û tamîna li dijî berpirsiyariyê

Tamîna nava malê milk û malê te yê şexsî, bi taybet tiştên di hundirê mala te de (mobîle, mokêt û merşan û hwd.), tiştên ku tu di malê de bikar tînî (firaxên xwarin û vexwarinê, cil û berg, televiziyon, cîhazên mûzîkê û hwd.) û tiştên te yên bi qîmet (zîv û zêr, pere û hwd.) ji ber şewatê, birûskan, diziyê, lehî û şapê û hwd. diparêze.

Tamîna li dijî berpirsiyariyê li gel tamîna icbarî ya nexweşiyê, tamîna herî giring e. Di hindek girêbestên malan de girêdana wê tamînê icbarî ye. Heger tu bêy zanebûna xwe ziyanekê bighînî kesekî din, wê demê û li gorî qanûnê divê tu bi hemî milk û malê xwe yê şexsî berpirsiyariya vê ziyanê hilgirî ser milên xwe. Heger tu tamînekê ji xwe re çêbikî û perekî kêm bidî, tu dikarî vê metirsiya hilgirtina berpirsiyariyê bavêjî ser milê kompaniya tamînê. Tamîna li dijî berpirsiyarê xwe dide ber ziyanên mala kirêkirî yan ziyanên avahiyê jî.



**Baca radyo û televiziyonê**
▶ www.serafe.ch

Her malek divê baca wergirtinê ji bo cîhazên radyo û televizyonê bide. Rêvebiriya karên niştecîyan ya berpirsê navçeya te ji ber xwe navnîşana te ji Dezgeha Siwêsrî ji bo Standina Baca Radyo û Televizyonê (Serafe) re dişîne.

**Jiyana di xaniyekî kirê de**
▶ [13]

Hemî niştecîyên avahiyeke kirê divê rêzê li rêbazên jiyana hevbeş bigirin. Divê mirov wek mînak qelabalix û dengê bilind bi şevê û li rojên yekşem û betalane de neke. Divê kirêcî rêbazên taybet ji bo jorên hevbeş, wek jora cilşûştinê di rêziknameya malê de bixwîne; ev rêziknameya malê bi girêbesta malê ve girêdayî ye. Heger tu çûyî maleke nû, here ba cîranên xwe û xwe bi wan bide naskirin. Mirov gelekî qedir û qîmetê vê pêngavê digire û ev yek wê gelek deriyan ji te re veke.

Û heger pirsgirêkên te bi kirêciyên din re çêbûn, zanibe, ku danûstandin çaeya herî baş e. Heger pêwîst bû, tu dikarî bi nûnerê kirêciyan yan dergevan re yan bi xwediyê avahiyê re biaxivî. Heger navkokî di navbera xwediyê avahiyê û kirêcî de çêbûn, tu dikarî hingî berê xwe bidî ▶[13] Beşê Şêwirdariya Qanûnî ya Hevbenda Kirêciyan.





### Terembêl

- www.strassenverkehrsamt.tg.ch
- [14]

Divê mirov ji bo bikaranîna autostradê û rêyîn terembêlan polekê (Vignette) bikire û ji hundirê terembêlê ve li cama pêşiya terembêlê bide. Tu dikarî vî polî bi 40 Frankî (behayê sala 2020an) li ba dikan û cihên corbecor ji xwe re bikî (Gumrikê, garacan. Rêvebiriyên Hatûçûnê, Rêvebiriyên Postê). tenê polên salane hene (ji 1. Kanûna pêşî ji sala kevin heta bi 31. Kanûna paşî ji sala nû misogir e). Li Siwêsrayê ev sînorên leza hajotinê misogir in: 50 km/h li nava bajêran, 80 km/h li dervey bajêran, 120 km/h li ser autostradê. Li nava bajêran cih hene, mirov mecbûr e li ser 30 km/h yan 20 km/h bajone. Rêjeya alkoholê di xwînê de ya herî zêde, ku misogir e 0.5 ‰.

### Anîna terembêlên taybet ji derve

Heger te berî kêmtir ji şeş mehan li dervey Welat terembêlek kiriye, wî çaxî divê tu li dema derbaskirina wê terembêlê bo nava Welat baca wê bidî. Lê heger mirov terembêl beriya bihtir ji şeş mehan kirîbe, wî çaxî ew terembêl hisab dibe ji milk û malê mirovî û ne mecbûr e bacê wê were dayîn. Terembêl yan motorên, ku mirov li dervey Welat tomar kiribe, mirov dikare wan li hundirê Siwêsrayê heta bi diwazdeh mehan bi serbestî bajone, heger tamîneke wan ji bo ziyanan hebe.

### Veguherandina mohleta hajotinê

Divê tu mohleta hajotinê ya biyanî ya taybet bi xwe di navbera diwazdeh mehan de piştî hatina xwe bo nava Welat bi mohleteke hajotinê ya siwêsrî re veguhêzî. Şert û mercên veguherandina mohleta hajotinê li gorî Welatan ji hev cuda ne. Taku mirov bikaribe terembêlan ji bo karên bazirganî û veguhestina mirovan û baran bajone, divê mirov mohleta hajotinê berî hajotina pêşî veguherîne.

Ew mohletên hajotinê, ku mirov kêmtir ji salekê berî hatina xwe bo nava Siwêsrayê standine, divê xwediyên wan ji bo dema sê salan dibin tecrubê de bin. Divê êdî mirov di navbera salekê de piştî hatina nava Welat tevlî kursekî xwendina li ser hajotinê bibe.

## Hatûçûna giştî

▶ www.sbb.ch

Siwêsra xwedî tevneke hatûçûnê ya pir û çir û bi hêz e. Bilêtên hatûçûnê bi tirênê, otubusê yan bi gemiyê hema bêje, beha ne. Tirêna Siwêsrî ya Federal (SBB) gelek aboneyên wê hene, ku mirov dikare bi wan bi erzanî li wesaytên hatûçûnê siwar bibe (wek mînak GA (Aboneya giştî), Halbtax, Aboneya mehane, seven25).

Zarok heta temenê şeş saliyê dikarin bê pere bi xwediyên xwe re li wesaytên hatûçûnê siwar bin. Zarokên temenê wan di navbera şeş û 16 salan de be, dikarin bi bilêta gencan bê pere li gel bavê xwe yan dayika xwe siwar bin (salane behayê wê 30 Frank in, behayê sala 2020an). Zarokên ku bi tena ser xwe seferê bikin û temenê wan ji şeş heta bi 16 salan be, nîvê behayê bilêtan didin.

▶ www.ostwind.ch

Heger tu bixwazibî wesaytên hatûçûnê yên giştî bi taybet li rojhilatê Siwêsrayê bikar bînî, wî çaxî tu dikarî bilêtekê yan aboneyekê li ba hevbenda tarîfê Ostwind bikirî, ku li çarçoveya hindek Herêmên taybet yan li seranserî rojhilatê Siwêsrayê misogir e.

## Biskilêt û peyada

▶ www.thurgau-bodensee.ch
▶ www.provelothurgau.ch
▶ www.ch.ch/de/velofahren-der-schweiz/

Hajotina biskilêt ji bo jîngehê baş e, erzan û tendirust e. Rêvebiriyên Dewletê piştgiriya hatûçûna bi biskilêtan û li ser lingan dikin. Hemî ziyanên, ku tu bi biskilêtê xwe bikî, tamîna te ya şexsî li dijî berpirsiyariyê hildigire ser milê xwe.






## Peydakirina karekî

- www.rav.tg.ch
- www.bizplus.tg.ch
- www.ostjob.ch
- www.arbeit.swiss

Taku mirov bikaribe karekî ji xwe re peyda bike, baştir e, ku mirov çareyên corbecor ji xwe re bikar bîne. Tu dikarî xwe ji bo wan karên li rojnameyan û li înternêtê têne belav kirin, pêşniyar bikî, tu dikarî ji ber xwe danûstandinê bi kompaniyan re bikî û pirsa kar bikî, tu dikarî danûstandinê bi nivîsîngehên peydakirina kar çêbikî û tu dikarî navê xwe li ba Navenda Herêmî ji bo Peydakirina Kar (RAV) tomar bikî.

## Dahat

Li Siwêsrayê dahatên giştî li beramber Welatên din bilind in; lê hema mesrefa jiyanê jî beha ye. Kêmtirîn dahatek ji bo hemî beşên kar misogir, tune ye. Lê hema li gelek beşên kar di çarçoveya girêbestên kar yên giştî de kêmtirîn dahat destnîşan dikin.

## Parastina ji bidawîanîna kar

Ev qanûn karkeran li dema nexweşiyê, rûdanan, ducaniyê û dayiktiyê ji ber betalkirina kar diparêze. Betalkirina girêbesta kar di vê demê de bi giştî ne karekî qanûnî ye û nayê qebûlkirin. Wek mînak, dema xwediyê kar girêbesta kar bi dawî bîne, ji ber ku karkerek daxwaza mafekî ji mafê xwe di çarçoveya kar de kiriye, hingî ew bidawîanîna kar li dijî qanûnê ye. Lê heger bidawîanîna kar bi şêweyekî ne qanûnî pêk hat, wê demê ew karker êdî nema dikare vegere ser karê xwe; lê belê ew dikare tenê li ba Dadgehê gilî bike û daxwaza





Kar

qerebûkirinekê ji xwe re bike.

## Bac

- [20]
- www.steuerverwaltung.tg.ch > Download eFisc

Li Siwêsrayê divê mirov baca dahata xwe û milk û malê xwe bide. Bi van bacan erkên giştî têne fînanse kirin, ku Deshilata Federal, Kanton û Navçe pêk tînin. Yekser piştî hatina te bo nava Kantonê, Rêvebiriya Navçeyê ji bo Bacê wê pirsnameyekê ji te re bişîne, taku ew ji bo destpêkê astê bacên te destnîşan bikin.

Heger tu kesekî biyanî bî û îqameyeke te ya hemdemî (C) tune be, wî çaxî ew dê baca dahatê yekser ji dahata te ya kar bikujin (Baca Çavkaniyê). Heger îqameya te ya hemdemî hebe, êdî li meha kanûna paşî pirsnameyên daxwiyanîkirina bacan ji te re tê şandin. Tu dikarî van pirsnameyan hem online li ser înternêtê jî tijî bikî. Heger zehmetî ji te re derketin, tu dikarî êdî daxwaza alîkariyê li şehirdariya bajarê xwe yan li wekîlekî/wekîleke pêbahwer bikî.

## Navkokî li ser cihê kar

- [21], [22]
- www.sexuellebelaestigung.ch

Heger navkokiyên te bi xwediyê karê te re yan bi hevkarekî te re hebin, tu dikarî serî li hevebendiya sendîkeya karkeran bidî û daxwaza şêwirdariyê li wan bikî. Hindek rabûn û rûniştin hene, ew ji aliyê qanûnî ve li ser cihê kar hatine qedexekirin. Bi taybet çavsorî û bêzarkirina cinsî û her wiha axaftin, liv û kiriyarên, ku kesên din pê têne bê rûmet kirin.





**Tunebûna-cêwazka-riyê**

Di Destûrê Siwêsrî de hatiye nivîsandin: <<Çênabe cêwazkarî li kesekî were kirin, bi taybet ne ji bo esil, nijad, zayend, temen, ziman, dîn, bîr û behweriyên siyasî û dinyayî>>. Heger hat û tu hest pê kir, ku kêmasiyek ji ber van sedeman li te tê, em te şîret dikin, ku tu danûstandinê bi yekê ji van Rêxistinên Yekîtiyê bikî:

- ▶ [22] Nivîsîngeha Yekîtiyê ji bo Wekheviya jin û mêr (EBG)
- ▶ [23] Komîsiyona Yekîtiyê li dijî Nijadperestiyê (EKR)

Heger tu tûşî cêwazkariya nijadî hatî, tu dikarî hem berê xwe bidî Navendên Pisporî û Beşên Hevguncînê ▶[3–9] yên Herêmî û bihêlî, ku ew şîretan li te bikin.

**Karê bi reşî**

▶ www.seco.admin.ch
▶ [24]

Hem kesên, ku car û baran ji ber karê paqijiyê, karê nava malê, karê baxçe yan guhdana zarokan pere distînin, wek karker têne hesbandin. Ew divê êdî ji aliyê xwediyê kar ve li ba Saziyên Tamînên Civakî were qeydkirin û xwediyê kar divê êdî baca çavkaniyê jê re bide, ji ber heger wisa nebe, ew kar, wek karekî qedexe, anku karê jê re dibêjin karê reş tê hesbandin.

Kesekî, ku bi reş, anku bê destûr, kar dike, heger hat û ziyanek gehayê yan heger bêkar bû, êdî mafê wî ji bo wergirtina perên xanenişîniya ji ber kêmendamiyê yan qerebûkirina li dema bêkariyê nastîne û êdî ew perên xanenişîniyê jî nastîne. Ev tê wê watê, ku encamên vî karê reş dibe gelekî xirab in, nexasim dema ku mirov li cihê kar birîndar bibe.

Mixabin hindek caran wisa çêdibe, ku xwediyên kar bi zanebûn belgên hisabê dahata kar nadin karkeran, taku li dema navkokiyek çêbû, ew bêjin na vî kesî li ba min kar nekiriye. Di rewşeke wisa de, kesê karker qet mecaleke wî tune ye, ku karkirina xwe li ba wî isbat bike, ji ber ev isbatkirina karkirinê giring e, taku mirov bikaribe wek nimûne perên bêkariyê bistîne.

**Tamîna li dijî bêkariyê**
▶ [16]
▶ www.awa.tg.ch
▶ www.arbeit.swiss

Heger kesekî karê xwe li Siwêsrayê ji dest da, wî çaxî li gorî qanûnê ew kes ji bo demeke destnîşankirî qerebûkirina bêkariyê distîne. Bi giştî wisa ye, ku kesê biyanî, ku cara pêşî tê Siwêsrayê, mafê wî ji bo wergirtina qerebûkirina bêkariyê tune ye. taku bikaribe vê qerebûkirinê bistîne, divê îqameyeke wî kesî ya misogir hebe û di herdu salên dawî de berî ragehandina bêkariyê, bi kêmanî 12 mehan karek kiribe. Her kesekî, ku karê xwe ji dest bide, divê ji bo wergirtina qerebûkirina bêkariyê bilez û bez navê xwe li ba Navenda Peydakirina Kar (RAV) qeyd bike. Li wê derê ew dê agahdariyan li ser pêngavên pêwîst bidine wî.

**Alîkariya civakî**
▶ [17–19]

Armanca alîkariya civakî ew e, ku hebûna xelkê biparêze û piştevaniya serbixwebûna aborî û şexsî ya kesên hewcedar bike. Ew tenê hingî didine xelkê, heger malbata wî kesî nikaribe wî xwedî bike û heger daxwaziya wergirtina alîkariyên qanûnî bike. Taku mirov bikaribe daxwaza wergirtina alîkariya civakî bike, divê mirov têkiliyê bi nivîsîngehên xizmetgûzariyên civakî li wê Navçeya, ku mirov lê dimîne, bike. ▶[17] Rêvebiriya Civakî ya Kantona Thurgauyê xwedî nivîsîngehe serperiştiyê ye. Nivîsîngeha Şêwirdariya Civakî û Deynan ya ▶[18] Caritasa Thurgauyê bê pere şêwirdariyê dide hemî kesên hewcdarê alîkariyê, alîkariyê ji bo demên kurt û di rewşên teng de dide xelkê û berê mirov dide sazî û dezgehên din yên şêwirdarî. ▶[19] Dezgeha Xêrxwazî Benefo şêwirdariyeke erzan li ser budceyê pêşkêş dike.

**Pereyên pêdivî**
▶ [15]

Tamînên Civakî niştecîyên Siwêsrayê ji metirsiyan diparêzin û hebûna wan ya aborî qayîm dikin. Çêkirina wan tamînan icbarî ye û (tamîna nexweşiyê ne tê de ▶li beşê tendirustiyê vegere) yekser ji dahata kar têne birîn. Perên icbarî bi giştî dikin 20 % ji dahatê.

**Pêşgîrî: stûna 1ê**

Stûna 1ê, ku Dewlet jê berpirsiyar e tamîna xanenişîniyê û tamîna paşmayên miriyan (AHV), tamîna kêmendamiyê (IV) û her wiha rêbaza bedelê karkirinê (EO) li xwe digire. Bi giştî hemî kesên li Siwêsrayê niştecî ne, bê ferq û cudahiya netewa wan û karê wan, dikevin bin banê tamîna AHV. Temenê xanenişîniyê ji bo mêran 65 sal û ji bo jinan 64 sal in (Çapa 2021an). Çêdibe, ku mirov berî bighîje vî temenî jî xanenişîn bibe. Êdî di rewşeke wisa de perên xanenişîniyê têne kurt kirin.

**Pêşgîrî: stûna 2ê**

Stûna 2ê jî, ku dikeve ser milê xwediyên kar, pêşgîriya pîşeyî ye (BVG), ku xelk jê re dibêje «Xezîneya xanenişîniyê». Heger dahata salane di ser 21‘510 Frankan re be (Çapa 2021ê) pişkên pere yekser ji dahata mirov têne birîn. Tamîna perên rojane yên nexweşan û tamîna rûdanên kar jî dikevin bin banê stûna 2ê. Her kesekî karker divê ji aliyê xwediyê karê xwe ve li ba tamîna rûdanan were qeydkirin. Heger mirov di heftiyê heşt saetan û bihtir kar bike, hingî mirov li dijî rûdanên bi kar ve negirêdayî jî tamînkirî ye. Heger tiştekî wisa nebe, divê mirov tamîneke taybet li dijî rûdanan ji xwe re çêbike. (▶beşê tendirustiyê).

**Pêşgîrî: stûna 3ê**

Beruvajî stûna 1ê û 2ê, stûna 3ê xwebexş e û di rêya wan perên mirov ji xwe re hilgirtî pêk tê. Pêşgîriya 3a, pêşgîriyeke demdirêj e, ku tê de serûmal ji bo pêşgîriya şexsî ya pîrîtiyê bi hev girêdayî dimîne. Mirov dikare tenê li gorî hindek şert û mercên taybet beşekî ji wan pereyan dîsa bikişîne, û li berambérî wê, dema mirov pere dide yan hildigire, mirov dikare heta bi radeyeke destnîşankirî, bacên xwe kêm bike. Pêşgîriya 3b ji aliyê şert û mercên dewletê li ser mijara dayîna pere, liberdestbûna wan û dema kişandina wan, vekirî ye.

| Stûna 1ê | Stûna 2ê | Stûna 3ê |
| --- | --- | --- |
| **Pêşgîriya dewletî** | **Pêşgîriya pîşeyî** | **Pêşgîriya şexsî** |
| **AHV: Tamîna xanenişîniyê û tamîna paşmayên miriyan**<br>**IV: Tamîna kêmendamiyê**<br>**EL: Xizmetgûzariyên temamker** | **BVG: Qanûna Federal ji bo pêşgîriya pîşeyî** (Di ser 21'510 Frankan re dahata salane, Çapa 2021ê) | **Di ser pêşgîriya icbarî re**<br>**Pêşgîriya girêdayî 3a**<br>**Pêşgîriya azad 3b** |
| **Icabrî ye** | | **Xwebexş e** |
| **Misogirkirina sînorê herî nizim ji hebûnê** | **Parastina asta asayî ya jiyanê** | **Temamkirin li gorî pêdiviyên şexsî** |

## Tamîna ji nexweşiyê û rûdanan

- ► www.bag.admin.ch
- ► www.gesundheit.tg.ch

Heger tu ji dervey Welat werî, divê tu vê tamînê di navbera sê mehan de ji xwe re çêbikî. Heger te ji Kantoneke din mala xwe bargir be, wî çaxî divê tu di navbera 30 rojan de belgeyeke tamînê pêşberî şehridariya navçeya xwe ya nû bikî.

Tamîna nexweşiyê ya icbarî xwe dide ber mesrefên nexweşiyê, dayiktiyê û yên rûdanan. Heger tu xwedî kar bî, wê demê tu dê di rêya kompaniya xwe ya kar re li dijî rûdanan tamînkirî bî. Di vê çarçoveyê de divê tu hay jê hebî, ku tu ne du caran li dijî rûdanan tamîn kirî bî.

Tamîna nexweşiyê ya icbarî xwe dide ber mesrefa tedawîkirina tendirustî, hindek dermanên taybet û tedawîkirina li beşê giştî yên nexweşxaneyên Kantona mirov lê niştecî ye. Di ser vê tamîna icbarî re, her kes dikare tamînên zêde ji xwe re çêbike, ku wek mînak xwe didine ber mesrefên tedawîkirinê li beşên taybet li nexweşxaneyan.

Dewlet mesrefên tamînan ji kesên tamînkirî re, ji hevjîn û malbatên rewşa wan ya aborî ne baş be, erzan dike.

Berî tu girêbesta tamînê ji xwe re girê bidî, here cihên şêwirdariyê û agahiyan ji xwe re peyda bike û pêşniyazên gelek kompaniyên tamînan bide ber hev.

## Bijîşk

- ► www.aerzte-tg.ch

Em te şîret dikin, ku tu bi lez û bez bijîşkekî/bijîşkeke malbatê ji xwe re hilbijêrî. Û dema pêdiviya te bi tedawîkirinê hebe, tu dikarî êdî herî ba bijîşkê xwe yê malbatê, taku li ser pirsên tendirustî şîretan li te bike, te ji aliyê tendirustî ve tedawî bike û heger pêwîst be te bişîne ba bijîşkekî/bijîşkeke pispor.

**Piştevaniya tendi-rustiyê û pêşlêgirî**
▶[25–27]
▶www.migesplus.ch
▶www.sozialnetz.tg.ch
▶www.femmestische.ch

▶[25] Perspektive Thurgau di warê piştevaniya tendirustiyê û pêşlêgiriyê de çalak e. Ji xizmetgûzariyên wê, şêwirdariya dayik û bavan, hevjînan, malbat û gencan e û her wiha şêwirdariya li ser kurmê kişandina madeyên hişbir e. Mirov dikare her wiha ji bo mijarên tendirustiya cinsî û nexweşiyên di rêya cins de vedikevin, bi taybet HIV û Aids here ba Perspektive Thurgau û şêwirdariyê ji wê werbigre.

Perspektive Thurgau serperiştiya «FemmesTische» dike. Ev civatên axaftinê behra bihtir jinên koçber tîne ba hev, ku di civînên nîqaşê de di çarçoveya şexsî yan ya dezgehî de li ser mijarên perwerdekirinê, jiyana rojane û ten-dirustiyê diaxivin. Kesên beşdar her wiha agahiyan li ser kulturê vî Welatî, li ser kursên ziman, baxçên zarokan, sîstema xwendinê li Siwêsrayê û sîstema tamînan û her wiha li ser cihên şêwirdariyê yên corbecor werdigirin. ▶[26] Alîkariya xwe bi xwe ya Thurgauyê agahiyan li ser komên heyîn yên alîkariya xwe bi xwe dide xelkê.





## Rewşên hawariya tendirustî

- ► Mirov dikare di rêya144 re têkiliyê bi hemî Her êman re bike.
- ► www.stgag.ch

Heger te di rewşeke hawarî de nikarîbû bijîşkê xwe yê malbatê peyda bikî, tu dikarî êdî telefûna bijîşkekî/bijîşkeke din li Herêma xwe yan telefûna nexweşxaneyeke Kantonê bikî.

Di rewên tengav de divê mirov telefûna nemra 144 bike.

| Bijîşkên Dewletê | Hijmara telefûnê |
|---|---|
| HerêmaThurgauya rojava | 052 723 77 77 |
| Herêma Thurtal-Untersee | 144 |
| Herêma Kreuzlingen | 0900 000 199 |
| Herêma Amriswil-Obersee | 0900 000 327 |
| Herêma Arbon | 0900 575 420 |
| Herêma Romanshorn | 0900 575 460 |
| Herêma Bischofszell | 0900 575 422 |
| Herêma Rickenbach/Wilen/Busswil/Wil SG/ Schwarzenbach SG | 0900 56 85 56 |

| | Hijmara telefûnê |
|---|---|
| Nexweşxaneya Kantona Frauenfeld | 052 723 77 77 |
| Nexweşxaneya Kantona Münsterlingen | 071 686 11 11 |
| Klinik St. Katharinental | 052 631 60 60 |
| Xizmetgûzariyên bijîşkiya derûnî yên Thurgauyê | 071 686 41 41 |
| Navenda pêşwazîkirin û ronkirinê ya bijîşkiya derûnî | 0848 41 41 41 |

## Guhdana dinanan

▶ www.zahnaerzte-thurgau.ch

Tamîna bingehîn ya nexweşiyê mesrefên tedawîkirina giştî ya dinanan, wek dema ku karyês û kulbûna lêvê yan rastkirina cihên dinanan (Têlên girêdana dinanan) peyda dibe, nade. Tu dikarî tamînekê ji bo guhdana dinanan girê bidî, berî ku pirsgirêk ji dinanên te re peyda bibin.

## Pîrejin û pîremêrên kêmendam

▶ www.sozialnetz.tg.ch

▶ [15], [28–32]


Agahdarî li ser xwedîkirin û guhdana mirovên pîr li ba van rêxistinên li xwarê li ber dest hene:

▶ [28] Kombenda Spitex ya Thurgauyê

▶ [29] Pro Senectute Thurgau

▶ [30] Xaça Sor ya Siwêsrî li Thurgauyê

Kesên xwedî kêmendamiyek laşî yan nefsî û her wiha kesûkarên wan dikarin li ba nivîsîngeha Tamîna Kêmendamiyê ya Kantonê ▶[31] Pro Infirmis yan – heger ew kes zarok bin – li ba ▶[32] perwerdekirina zû ya pêdagogîka tedawîkirinê, şîretan û alîkariyê werbigirin.





## Zewac û anîna malbatê
▶[33]

Her kesekî/keseke, ku bixwazibe li Siwêsrayê bizewice, divê temenê wî/ wê bi kêmanî 18 sal bin. Tenê ew zewacên, ku li ba dayîra nifûsê ya medenî hatine encamdan, têne qebûlkirin. ▶[33] Rêvebiriya qeydkirina bazirganî û karûbarên kesayetî yan dayîra nifûsê ya medenî ya berpirsê Herêma te dikare te li ser şert û mercên pêdivî ji bo zewacê û belge û dokumentên pêwîst agahdar bike.

▶www.migrationsamt.tg.ch

Heger tu plan dikî, ku hevjîna xwe yan hevjînê xwe yan endamekî din yê malbata xwe bînî nava Welat, divê berî her tiştî tu daxwaznameyekê li ba Rêvebiriya Xizmetgûzariyên Nişteciyan ya berpirsê Navçeya xwe ji bo anîna endamekî malbatê pêşkêş bikî. Ji bo dayîna îqameya niştecîbûnê ▶[1] Rêvebiriya Koçberiyê berpirs e. Tu dikarî li ser malpera înternêtê ya Rêvebiriya Koçberiyê pirsnameyên daxwaznameyê û lîstekê tevî belgeyên pêwîst peyda bikî.

## Hevjîniya tomarkirî
▶[33], [34]

Hevjînên hevzayend derfet heye, ku daxwaziya qebûlkirina peywendiya xwe bikin, anku ew dikarin hevjîniya xwe qeyd bikin. Dayîra Nifûsê ya Medenî ya berpirsê wê Herêma, ku yek ji wan hevjînan tê de dijî, dikare wan kesan li ser pêngavên pêwîst agahdar bike.

▶www.zivilstandsamt.tg.ch
▶www.binational.ch



### Zewaca bi darê zorê
▸ [19], [35]

Kesekî/kesekê maf nîn e, ku zorê li jinekê yan li mêrekî bike û wî/ wê bi darê zorê li dijî xwesteka wan bizewicîne. Zewcandina bi darê zorê karekî cezayî ye. Ew binpêkirineke dijwar e ji bo azadiya şexsî. Ew wan mafên bingehîn yên mirovan bin pê dike, ew mafên, ku ji aliyê Destûra Federal û Destûra Thurgauyê ve têne parastin.

### Çêkirina zarokan û agahdariyên li ser cins
▸ [19], [25]

Heger pirsên te li ser dirustkirina malbatê, ducaniyê (wek mîna kontrolkirina berî jidayikbûnê) yan li ser jiyana cinsî hebin, tu dikarî wê demê berê xwe bidî ▸[19] Nivîsîngeha Şêwirdarî ji bo Dirustkirina malbatê, ducaniyê û cins ya Dezgeha Benefo. Û heger pirsên te li ser tendirustiya cinsî hebin, tu dikarî alîkariyê ji bijîşka/bijîşkê malbatê û her wiha ji ▸[25] Perspektive Thurgau bistînî.

Tu dikarî bi wan cihên navê wan li jor hatî gotin, li ser mijarên mîna pêşlêgiriya ducaniyê, cins, meyldariya cinsî, ducaniyê, bidawîanîna ducaniyê, nexweşiyên cinsî yên vekeftinê, zordariya cinsî, hestên evîndariyê û peywendiyên evîndarî biaxivî. Ev şêwirdarî bê pere ne yan tamîna nexweşiyê xwe dide ber mesrefa wan û gelekî bi siryet û nepenî ne.

Rêjeya mirina zarokên sava li Siwêsrayê gelekî kêm e. Ew pişkinînên bê pere yên tendirustî û pêşlêgir ji heftiya 13emîn ya ducaniyê ve û li pêvajoya dema ducaniyê, ew kursên amadekirina jidayikbûnê û şêwirdariya şîrdanê alîkariyeke mezin di vî warî de dikin. Pirsgirêkên tendirustî heta heftiya 12emîn ya ducaniyê wek nexweşî têne hisabkirin û dikevin bin erkê dayîna beşekî ji mesrefê (Beşê pere, ku kesê tamînkirî ji ba xwe dide). Şêwirdariya dayik û bavan û her wiha ya zarokên biçûk, ku ji aliyê ▸[25] Perspektive û conex familia ve têne pêşkêşkirin, xizmetgûzariyên giring û bê pere ne.

---

- ▸ www.sozialnetz.tg.ch
- ▸ www.conexfamilia.ch
- ▸ www.guter-start-ins-kinderleben.tg.ch

## Ducanî û jidayikbûn

- [19]
- www.tageo.ch
- www.femmestische.ch
- www.sozialnetz.tg.ch

Divê tu her jidayikbûnekê li ba Dayîra Nifûsê ya Medenî ya Herêma xwe ragehînî. Heger zarok li nexweşxaneyê çêbibe, wê demê nexweşxane jidayikbûna wî li ba Dayîra Nifûsê ya Medenî radigehîne. Û heger zarok li malê çêbibe, divê wê demê dayik û bavê wî jidayikbûna wî ragehînin. Daxwaznameya dayîna îqameya niştecîbûnê li ba Rêvebiriya Koçberiyê bêy te ji aliyê Rêvebiriya Xizmetgûzariyên Niştecivan ya Herêma te tê pêşkêşkirin.

Ew zaroka nû çêbûyî ji roja pêşî de di her sê mehên pêşî de ji ber xwe li dijî nexweşiyê tamînkirî ye. Ji meha sêyem û wê ve divê dayik û bav tamîneke nexweşiyê li ser navê zaroka xwe girê bidin.

## Bîhnvedana dayikbûnê û qerebûkirina wê

- www.bsv.admin.ch
- [15]

Piştî jidayikbûnê jinên xwedan kar mafê wan ji bo bîhnvedaneke bi mûçe heye, bi kêmanî ji bo 14 heftiyan. Di vê demê de heta bi 80 % ji mûçeyê wan berdewam ji wan re tê. Taku ew sûdê ji vê xalê bigirin, divê wan di wan neh mehên berî jidayikbûnê, perên tamînên civakî dabin û di vê demê de bi kêmanî pênc mehan kar kiribin. Hem ew demên kar, ku li Welatiyek ji Welatên Yekîtiya Europayê yan yên Hevbendiya Azadiya Bazirganî (EFTA) jî hatine encamdan, têne

- www.perspektive-tg.ch/muetter-und-vaeter
beratung





hisabkirin. Bavên karker ji 1ê Çileyê paşîn ji sala 2021ê ve mafê wan heye, ku du heftiyan bîhnvedana bavîtiyê bistînin. ▶[15] Xezîneya Qerebûkirinê ya Kantona Thurgauyê dikare agahdariyên rasteqîn bide te.

**Pereyên zêde ji bo malbatan**
▶[15]

Heger zarokên te li Kantona Thurgauyê hebin, mafê te ji bo wergirtina perên zarokan heye. Bilindiya vê alîkariyê ji bo zarokan heta bi temenê 16 saliyê serê her zarokekî heyvane 200 Frank in. Piştî hingî li şûna vê alîkariya zarokan, alîkariyeke (bihtir) ji bo xwendina pîşeyî heye, heyvane serê her zarokekî heta bi qedandina xwendina pîşeyî ya zaroka te, gelek dirêj, heta bi 25 saliyê ye. Dibe, ku hindek caran ev alîkarî ji temamkirina temenê 15 saliyê ve were dayîn. Behra bihtir wisa ye, ku xwediyê kar van alîkariyên malbatê li gel mûçeyê kar dişîne. Dibe ku li gorî hindek şert û mercên taybet dayik û bavên bêkar jî alîkariya zarokan û alîkariya xwendina pîşeyî bistînin.

▶[15] Xezîneya Qerebûkirinê ya Kantona Thurgauyê dikare agahdariyan li ser vê mijarê bide te.

**Mafên zarok û gencan**
▶[19], [35]
▶www.tschau.ch

Zarok û genc jî mîna mezinan xwedan mafên bingehîn in. Bi taybet mafê wan ji bo parastina ji azardanê, ji zordariyê, ji tundutjiya cinsî û ji talankirina wan di rêya kar de heye û mafê wan her wiha heye ji bo xwendinê û astekî jiyanê yê bikêrhatî (Mal, Cil, Xwarin). Dayik û bav çênabe, ku li zarokan û gencan bidin û ew jî çênabe li kesekî bidin. Mafê zarok û gencan ji bo sax û silametiya laşî û parastina ji birînên laşî heye.

Sûnetkirina keçan qedexe ye û ev kiriyarên bi vî rengî ji aliyê qanûnî ve bi dijwarî têne cezakirin, herçende, ku ew di çarçoveya malbatî de yan li dema mayîna malbatê li dervey Welat, werine encamdan.

## Pirsgirêkên hevjîn û malbatan

▶ www.paarberatungen-tg.ch

Ew kesên, ku navkokiyên wan bi zarokên wan re yan bi hevjînên wan re hene, dikarin alîkariyê li Cihên Şêwirdariya Hevjîn û Malbatan werbigirin. Li dema cudabûnê yan jinberdanê yan mêrberdanê, divê ew dayik yan bavê, ku zarokan xwedî nake, mehane perên xwedîkirina zarokan bide, û dibe ku perên xwedîkirinê bide jina xwe yan mêrê xwe, ku zarokan xwedî dike. Agahdariyên li ser alîkariya xwedîkirinê:

▶ www.sozialamt.tg.ch > Sozialhilfe > Alimentenhilfe

## Zordariya li nava malê de

▶ [19], [35–37]

Heger hindek kes di çarçoveya peywendiyeke hevjîniyê ya piştî cudabûnê ji hev, ya di çarçoveya peywendiyeke hevjîniya hevzayendî yan malbatî zordariya laşî (lêdan), nefsî (tehdîd), cinsî (Mecbûrkirin, tecawizkirina cinsî) yan aborî (nedana pere) bikar bînin yan tehdîdê bi encamdan wê bkin, mirov êdî van kiriyaran bi zordariya li nava malê de bi nav dike. Ev kiriyar ji aliyê qanûnî ve tê şopandin û cezakirin, herçende ku kesê qûrbanî bi xwe jî gilî neke. Divê tewanbar zanibin, ku ew dê bi dijwarî werin cezakirin.

Her kesekî qûrbanî dikare li gorî qanûna alîkariya qûrbaniyan bê pere şêwirdariyê û alîkariyê li ba cihekî alîkariya qûrbaniyan werbigire

▶ [19] Dezgeha Benefo, Cihê pisporî ya alîkariya qûrbaniyan li Thurgauyê
▶ [35] Cihê şêwirdariyê ji bo jinên tûşî zorariyê bûyîn li Thurgauyê
▶ [36] Cihê pisporî yê zordariya li nava malê de, Polîsên Kantona Thurgauyê
▶ Polîs (Telefûn) di rewşên hawarî de û ji bo alîkariyê li her derê: 117

Ji bo wan kesên zordariyê li kesên din dikin yan meyldarên lêdanê ne, ji wan jî re xizmetgûzariyên şêwirdariyê hene. Karmendên van cihan kefaletê didin, ku ev hevpeyvîn gelekî bi siryet û nepenî ne.

▶ [37] Konflikt.Gewalt – Şêwirdariya Zordariyê ji bo mêran, jinan û gencan
▶ Xeta germ (Telefûn) şev û roj ji bo kesên lêdanê dikin vekirî ye: 078 778 77 80

**Dibistana gel**
► www.dek.tg.ch

Çûyîna Dibistana Gel ji bo wan zarokan icbarî ye, ew yên ku heta destpêka sala xwendinê li havînî bûne çar salî. Erkê çûyîna dibistanê (li gel baxçê zarokan) 11 salan dewam dike û hem ji bo wan zarok û gencên bê destûrnameyeke misogir ya niştecîbûnê misogir e. Dibistana Gel bê pere ye. Berpirsê Xwendinê li Kantona Thurgauyê, Rêvebiriya Perwerdê û Kultur (DEK) e.

**Belavok: „Derfetên xwendinê li Kantona Thurgauyê"**
► www.dek.tg.ch > Publikationen und Downloads > Bildung

Belavoka «Derfertên xwendinê li Kantona Thurgauyê» sîstema xwendinê li Kantona Thurgauyê ji destpêka dibistanê heta qûnaxa sêyemîn ya xwendinê şîrove dike û bi zimanên cporbcor li ber dest heye. Gelek agahdariyên giring li ser dibistana gel, li ser sîstema xwendna pîşeyî û li ser dibistanên bilind tê de hene. Hem navûnîşanên cihên şêwirdarî û serlêdanê jî tê de hene.

**Berpirsiyariya dayik û bavan**
► www.tageo.ch

Hun wek dayik û bav berpirsê perwerdekirin û xwendina zarokên xwe ne. Ji roja jidayikbûnê ve hawîrdoreke serincrakêş û aram ji zaroka xwe re biafirîne! Livîn, peywendiyên civakî li gel zarokên hevtemen û zarokên, ku heman zimanê herêmî, anku zimanê zikmakî diaxivin, gelekî ji bo mezinbûn û geşbûna zaroka te giring in. Xwendina dayik û bavan piştgiriya te dike, taku tu karibî baş bi erkê perwerdeyî yê giring rabî. Hun dikarin her wiha wek dayik û bav gelek tiştên baş ji bo geşpêdaneke baş ya dibistanê ji bo zaroka xwe bikin: Hewl bidin, ku hevkariya we li gel dibistanê baş be û guh bidin zarokên xwe, taku veysehayî, paqij û serwext tevlî xwendina xwe li dibistanê bibin. Heger hat û dibistanê hun vexwendî hevpeyvînekê yan civîneke dayik û bavan kirin, hun mecbûr in beşdarî van civanan bibin.

### Guhdana zarokan di ser guhdana malbatê û ya dibistanê re

► www.sozialnetz.tg.ch

Li Kantona Thurgauyê gelek pêşniyarên guhdana wan zarokan hene, yên ku dayik û bavên wan nikarin her dem guh bidin wan, ji ber ku wek mînak kar dikin. Li gorî temenê zarokan û çendahiya guhdana pêdivî (sibê, nîvro, piştî dibistanê) pêşniarên corbecor hene. Hindek pêşniyarên taybet hene, rasterast pêştevaniya jêhatbûnên civakî, zimanî û livîna laşî dikin. Şehirdariya Navçeya we wê ji dil û can we li ser pêşniyarên li Herêma we agahdar bike.

### Zarokên xwedan zimanên biyanî

► [12], [40], [2–8]

Ji bo çûyîna dibistanê, giring e, ku zaroka we zimanê elmanî fahm bike û bikaribe bi zimanê elmanî bide û bistîne. Zanebûna bi zimanê elmanî bi şêweyekî baş mercekî bingehîn e ji bo ku zaroka we di dibistanê de biserbikeve. Derfetekî baş ji bo zarok hîn berî çûyîna dibistanê fêrî zimanê elmanî bibin, ew e, ku zarok tevlî komeke lîstikê yan baxçê zarokan bibin (KITA) yan herin ba malbateke rojane.

---

**Li gel min biaxive û li min guhdarî bike**

► Belavokeke bi zimanên corbecor e li ser www.migesplus.ch

**65 kurte filmên li ser fêrbûna di temenê bicûk de li jiyana rojane:**

► www.kinder-4.ch

**Kursên li ser ziman û çanda Welatî:**

► www.hsk-tg.ch

Hem zimanê te yê dayikê jî dibe alîkar ji bo ku zaroka te fêrî elmanî bibe: Ji roja jidayikbûna zaroka te ve gelek şêweyên lêxweşkirina fêrbûna zimanan jê re peyda bike. Li gel zaroka xwe biaxive û guhdariya wî bike, çîrokan yan ristan jê re bêje û bi zaroka xwe re stranan bêje! Û zaroka te dikare her wiha beşdariyê di kursên fêrbûna ziman û kultura Welatê xwe de (HSK) bike, ku ji aliyê Konsulxaneya Welatê te ve yan ji aliyê endamên civaka te ve têne pêşkêşkirin. Zaroka te di vê dersê de bihtir fêrî zimanê dayika xwe dibe û zaniyariyên berferehtir li ser kulturê Welatê xwe distîne. Mirov dikare li ►[12] pirtûkxaneya çandan pirtûkên zarok û gencan bi zimanên corbecor bi emanet ji xwe re bibe û piştra li wan vegerîne.

Şehirdariya cihê niştecîbûnê yan ►[2–8] navendên pisporî û beşên pisporî yên hevguncînê li Herêma te dikarin bi dil û can alîkariya te bikin, taku tu bikaribî pêşniyareke baş ji xwe re peyda bikî.

### Baxçê zarokan (ji temenê 4 saliyê de)

▶ [38]

Baxçê zarokan qûnaxa pêşî ya xwendinê ye û du salan dewam dike. Zarok di rêya lîstik û yariyan de fêrî şert û mercên seredana dibistana seratayî dibin. Û di heman demê de fêrî danûstandina civakî dibin. Zaroka te li baxçê zarokan fêrî dirustkirina peywendiyan dibe û hem fêrî zimanê herêmî dibe.

### Dibistana seratayî (ji temenê 6 saliyê de)

▶ [38]

Dibistana seratayî şeş salan dewam dike. Ew zarokan fêrî zanebûn û jêhatbûnên bingehîn dike, piştevaniya hêzên zarokan yên laşî û mûzîkî û hişmendî yên taybet dike û wan perwerde dike, taku serbixwe û bi berpirsiyarî di civakê de tev bigerin. Şagirt fêrî jêhatbûnên nû dibin, taku bikaribin roj bi roj serbixwe xwe agahdar bikin û fêr bibin.

### Dibistana navendî I (ji temenê 12 saliyê de)

▶ [38]

Dibistana navendî sê salan dewam dike. Di vê qûnaxê de naverokên xwendina dibistana seratayî têne kûrkirin û berferehkirin. Genc ji xwe re bingeheke qayîm ji bo pêvajoya xwendin û karê xwe ava dikin. Dersdan li ser astên jêhatbûnê yên corbecor tê pêşkêşkirin.





### Şêwirdariya li ser pîşe û xwendina zankoyî

▶ www.abb.tg.ch
▶ [39]

Li dibistana navendî I genc li ser armancên xwe yên pîşeyî û xwendinê û her wiha li ser şert û mercên wan û li ser derfetên xwe radiwestin. Şêwirdariya pîşeyî û zankoyî di vê pêvajoyê de alîkariya wan dike. Heger pêdivî hebe, derfet ji bo wergirtina alîkariyeke pisporî ya zêde jî heye.

### BIZplus piştevaniya pêşkêşkirina daxwaznameyên kar

▶ www.bizplus.tg.ch

Navenda agahdariyan ya pîşeyî BIZplus li Frauenfeldê û li Kreuzlingenê heftê carekê şêwirdariyê bê pere ji bo hemî kesên li Thurgauyê niştecî ne, pêşkêş dike. Pisporên BIZplus dikarin alîkariya te bikin ji bo dirustkirina belgên daxwaznameyan û şêwirdariyê li ser mijarên girêdayî bi lêgerîna li kar, lêgerîna li cihên xwendina pîşeyî û berdewamiya xwendinê û derfetên pêvjoya pîşeyî didin te.

### Xizmetgûzariyên demikî

▶ www.abb.tg.ch
> Brückenangebote
▶ www.abb.tg.ch > BIZ

Gencên ku çareyek ji bo qûnaxa di pey dibistana navendî I re peyda nekirine, dikarin herin salekê beşdarî xizmetgûzariyeke demikî ya kantonî bibin. Li vir bi şêweyekî rasterast alîkariya wan ji bo pêvajoya hilbijartina pîşeyekî tê kirin. Ew dikarin li vir jêhatbûnên xwe yên bingehîn yên dibistanê berfereh û kûrtir bikin û ew dikarin her wiha ji xwe re tecrubeyên praktîk di kompaniyekê de kom bikin. Xizmetgûzariya kantonî du şêweyên xizmetgûzariyên demikî nas

---

▶ www.berufsberatung.ch
> Informationen in anderen Sprachen






dike, giraniya beşekî ji wan li ser xwendinê ye (Typ A) û giraniya beşekî din ji xizmetgûzariyên demikî li ser karê praktîk e (Typ P).

### Kursên hevguncînê

- www.abb.tg.ch > Integrationskurse
- www.abb.tg.ch > BIZ

Giraniya kursên hevguncînê yên kantonî li ser fêrkirina zimanê elmanî û zanebûna giştî ye. Genc û mezinên temenê wan di navbera diwazdeh û 34 salan dikarin tevlî van kursan bibin. Mirov bi alîkariya wan şert û mercên dibistana navendî, xwendineke bingehîn ya pîşeyî (EBA yan EFZ) yan dibistaneke bilind pêk tîne. Çar kursên corbcor li gorî hev sazkirî têne pêşkêş kirin. Astê zanebûna bi zimanê elmanî giring e ji bo hilbijartina kursê bikêrhatî û ji bo veguhestin yan çûyîna qûnaxa bilindtir ji kursê hevguncînê.

### Pêşniyariyên xwendina pîşeyî yên nizim

- www.abb.tg.ch > Niederschwelliges Ausbildungsangebot
- www.abb.tg.ch > BIZ
- www.abb.tg.ch > Niederschwellige Integrationsausbildung

Gencên xîretkêş, ku şert û mercên pêwîst ji bo xwendineke bingehîn ya pîşeyî (EBA/EFZ) pêk nayînin, dikarin piştî qedandina xwendina dibistanê ya icbarî, dest bi xwendindeke pîşeyî ya nizim bikin. Ev karê pîşeyî du salan dewam dike û hem ji karekî praktîk di kompaniyekê de û hem ji xwendineke li dibistaneke pîşeyî pêk tê. Di navbera gencê xwendevan û kompaniya karê pîşeyî girêbesteke karê pîşeyî tê girêdan, ku tê de gelek tişt têne nivîsandin, yek ji wan jî mûçeyê şagirt ji bo karê wî yê praktîk. Koçberên, ku bi zimanên biyanî diaxivin, dikarin ji 18 saliyê û di ser re tevlî karekî pîşeyî hevguncîn yê nizim bibin



**Li dawiya dema xwendina dibistana icbarî genc yan xwendineke bingehîn ya pîşeyî yan jî seredana dibistaneke bilind hildibijêrin.**

## Xwendina bingehîn ya pîşeyî (ji temenê 15 saliyê de)

▶ [39]

▶ www.berufsberatung.ch > Lehrstellensuche

Sê çaryekên gencan xwendineke bingehîn ya pîşeyî (xwendina pîşeyî) dixwînin. Di çarçoveya vê xwendinê de li kompaniyeke xwendina pîşeyî fêrî jêhatbûnên pêdivî ji bo vî karî dibin û rojekê yan du rojan di heftiyê de diçine dibistaneke pîşeyî. Genc ji kompaniya xwe ya xwendina pîşeyî ji bo dema karê xwe yê pîşeyî girêbesteke xwendina pîşeyî werdigirin û hem mûçeykî ji bo wî karê ku pêk tînin, distînin. Xwendina bingehîn ya pîşeyî du heta bi çar salan dewam dike û li dawiyê mirov bawernameyeke pîşeyî ya Yekîtiyê (EBA) yan bawernameyeke jêhatbûnê ya Yekîtiyê (EFZ) werdigire. Ev nasname li seranserî Siwêsrayê misogir in.

## Bakaloriya pîşeyî

▶ [39]

Bakaloriya pîşeyî (BM) zanebûneke giştî ya berfereh li ser xwendina bingehîn ya pîşeyî EFZ zêde dike. Mirov dikare wê li dema xwendina pîşeyî (BM1) yan piştî qedandina xwendina bingehîn ya pîşeyî EFZ (BM2) çêbike û werbigire. Bakaloriya pîşeyî derfetê li pêşiya mirov vedike, ku li zanîngeheke pisporî bixwîne û ew mirov ji bo erkên mezin di warê aborî de û di civakê de amade dike.

Û heger mirov ezmûneke zêde çêbike û tê de biserkeve, êdî mirov dikare here li zanîngehekê yan li zanîngeheke teknîkî ya Yekîtiyê (ETH) jî bixwîne. Mirov dikare di rêya seredana kursekî yeksalî ji bo ezmûna zêde (Passerellenkurs) li dibistana bakaloriya ya Thurgauyî-Schaffhauserî ji bo mezinan xwe ji bo vê ezmûnê amade bike.

## Dibistanên navendî (ji temenê 15 saliyê de)

Şagirt dikarin piştî dawiya dema xwendina dibistana icabrî herin dibistaneke navendî ya înformatîk yan herin dibistaneke amadeyî. Li gorî coreyê dibistanê ew derfetê li pêşiya şagirtan vedikin, ku yan yekser herin têkevin nav warê kar-

▸ [41]
▸ www.amh.tg.ch
  > Mittelschulen

kirinê yan herin zanîngeheke pisporî, zanîngeheke giştî, zanîngeheke teknîkî ya Yekîtiyê (ETH) yan herin zanîngeheke perweredeyî.

| Coreyê dibistanê | Dem | Dîplom |
|---|---|---|
| Dibistana navendî ya pisporî | 3 sal<br><br>4 sal | Belgeya dibistana navendî ya pisporî<br><br>Bakaloriya pisporî |
| Dibistana navendî ya înfor-matîk | 4 sal | EFZ Înformatîkkar li gel bakaloriya pîşeyî |
| Dibistana amadeyî | 4 sal | Bawernameya Bakaloriya dibistana amadeyî |

## Dibistanên bakaloriya yên Thurgauyî-Schaffhauserî ji bo mezinan

▸ [43]

Kesên mezin û karker, ku şert û mercên pêdivî pêk tînin, dikarin di ber karê xwe re herin dibistana bakaloriya ya Thurgauyî-Schaffhauserî ji bo mezinan (TSME) û bakaloriya ji xwe re bistînin. Şagirtên baş jêhatî yên bawernameya bakaloriya pisporî derfet li ber wan vekirî ye, ku herin kursekî zêde ji bo ezmûnê (Passerellenkurs) bixwînin. Ew kursê yeksalî ji bo ezmûna zêde (Passerellenkurs) mirov ji bo ezmûna zêde amade dike, ku êdî biserketina di wê ezmûnê de maf dide mirov, ku here li zanîngeheke giştî ya Siwêsrî bixwîne.



## Xwendina pîşeyî ya bilind

▶ www.sbfi.admin.ch
▶ www.abb.tg.ch > Bildungszentren

Xwendina pîşeyî ya bilind mirov fêrî jêhatbûnan dike, ku ji bo encamdana karekî mezin û berpirsiyane pêdivî ne. Ew piştî wergirtina bawernameya jêhatbûnê ya Yekîtiyê (EFZ) yan wergirtina bawernameyeke heman nirx li qûnaxa dibistana amadeyî, derfet ji bo mirov vedike, ku mirov fêrî pisporiyekê bibe yan kur mirov jêhatbûnên xwe yên pisporî kûrtir bike û mirov dikare di çarçoveya wê de jêhatbûnan di warê birêvebirina kompaniyan de werbigire. Xwendina pîşeyî ya bilind ji ezmûnên Yekîtiyê (Ezmûna pîşeyî (BP) û Ezmûna pisporî ya bilind (HFP)) û beşên xwendinê li dibistanên pisporî yên bilind (HF) pêk tê.

## Zanîngeh

▶ [41]
▶ ww.abb.tg.ch > Berufs- und Studienberatung

Gelek coreyên Zanîngehan li Siwêsrayê hene: Zanîngehên giştî, zanîngehên pisporî û zanîngehên pisporî yên perwerdeyî. Sîstema xwendinê ya siwêsrî bi şefafiyeta xwe tê naskirin: wek nimûne, rêyên corbecor hene ji bo ku mirov bikaribe dest bi xwendineke zankoyî bike. Gencên, ku bakaloriyeke pîşeyî yan bakaloriyeke pisporî standina, dikarin herin zanîngeheke pisporî bixwînin. Û her wekî din jî kesên, ku bakaloriya wan ya pisporî yan pîşeyî heye, dikarin di rêya ezmûneke zêde de (Passerellenprüfung) xwendineke zankoyî li zanîngehekê yan li zanîngeheke teknîkî ya Yekîtiyê (ETH) bixwînin.

Gencên, ku dibistana amadeyî bi bakaloriyeke li Siwêsrayê qebûlkirî, qedandine, dikarin herin li Zanîngehan, li zanîngehên teknîkî yên Yekîtiyê (ETH), li zanîngehên pisporî yên perwerdeyî – piştî karekî ezmûnî yê yek salî – li zanîngehên pisporî bixwînin.

▶ www.ecus-edu.ch

Kesekî, ku ji dervey Welat hatibe, ne yekser tê qebûlkirin, herçende ku ew kes li Welatê xwe bi serbestî karîbû here li zanîngehê bixwîne. Heger pêdivî hebe, mirov dikare ezmûnên zêde ji bo xwendina zankoyî li Siwêsrayê bixwîne û bi serkeftin encam bide.

## Pereyên xwendin û karê pîşeyî

- www.stipendien.tg.ch
- [42]

Mirov dikare li gorî hindek şert û mercên taybet ji bo karê pîşeyî û ji bo xwendina zankoyî alîkariya madî yan qerzekê bistîne. Tu dikarî agahdariyên li ser vê mijarê ji ba ▸[42] beşê alîkariya madî ji bo karê pîşeyî yê Rêvebiriya Zanîngehan û Dibistanên Navendî werbigirî.

## Nasandina dîplom û xwendina zankoyî

- www.sbfi.admin.ch
- [44]
- www.heks.ch/mosaiq-ostschweiz

Ji bo nasandina dîplomên li dervey Welat hatine standin, heger hat û mirov xwest di wan waran de kar bike, Amîndariya Dewletê ji bo Xwendinê, Lêkolînê û Nûkariyê (SBFI) berpirs e. Ji bo qebûlkirina xwendekaran li zanîngehan, ew zanîngehên peywendîdar berpirs in.

Dibe ku bihtir ji pênc salan tecrubeya te di warê karkirinê de hebe. Tu dikarî li gorî hindek şert û mercên taybet bihêlî, ku ev tecrubeya te were hisabkirin û bi vî hawî bawernameyeke pîşeyî, ku li Siwêsrayê naskirî, werbigirî. ▸[44] Beşê pisporî yê bawernameyên pîşeyî ji bo mezinan (BAE) dikare bi dilxweşî agahdariyan li ser vê mijarê bide te.

Beşê pisporî HEKS MosaiQ Ostschweiz şêwirdariyê û alîkariyê ji bo koçberên xwende û pispor (wek nimûne di warê nasandina dîploman, temamkirina xwendina kêm) pêşkêş dike.

## Berdewamiya xwendinê ji bo mezinan

- www.abb.tg.ch > Bildungszentren
- www.weiterbildung.ch
- www.ausbildung-weiterbildung.ch

Li Siwêsrayê gelek kesên mezin diçin kursên berdewamiya xwendinê, taku wê zaniyariya xwe ya ji bo karê wan pêwîst e, baştir bikin yan taku xwe fêrî tiştekî nû bikin. Xwediyên kar xwe didine ber mesrefên beşekî ji van karên pîşeyî. Kesekî, ku di pêvajoya jiyana xwe ya pîşeyî de herdem xwe di warê xwendinê de pêş bixe, şansên wî bihtir in, ku bikaribe karekî baş ji xwe re peyda bike û bo demeke dirêj li ser karê xwe bimîne. Xwe li ba kompaniya xwe yan li ba navendeke xwendinê li Thurgauyê agahdar bike.

**Guhdana sirûştê**

Thurgau wek çêkereke xurakê ya giring bi şêweyekî cewherî dibe alîkar ji bo dabînkirina xwarin û vexwarinê. Çandiniya wê li gel 8.000 karkerên wê beşekî giring ji aboriya niştimanî ya Thurgauyê pêk tîne. Sirûştek rengareng û ji aliyê jîngehî ve giranbeha divê piştgiriya wê were kirin û were parastin. Divê sirûşta me, daristanên me û çem û avên me bi rêkûpêkî sûd ji wan were kirin û divê mirov pabendî tiştên serbest û qedexe be. Wek nimûne qedexe ye, ku mirov di nav zeviyan re bi rê de here, ziyanan bigihîne daran, heywanan bitirsîne yan gilîje û bermayên xwe di nava sirûştê de bihêle.

**Rêzlêgirtina li cihên giştî**

Her Navçeyek rêbazên wê hene, ku di rêya wan re xelkê li ser rabûn û rûniştinên li cihên giştî agahdar dikin. Wek mînak tê de hatine nivîsandin, ku divê mirov bermayên xwe bavêje zembîleke bermayan, ku qedexe ye, mirov qelabalix û dengê bilind ji xwe bîne yan ka divê mirov çi tedbîran pêk bîne, taku heywanên nava malê cîranan aciz nekin. Tu dikarî daxwaza wergirtina kopiyekê ji van rêbazan li Rêvebiriyên Xizmetgûzariyên Niştecîyan bikî.

**Komkirina qirêj û bermayan**

Li Siwêsrayê 95 % ji şûşeyan (350.000 Ton salane), 90 % ji Aluminium (13.000 Ton), 80 % ji betlên lastîkî (40.000 Tonn) û 80 % ji kaxezan (1.2 Mio. Ton) ji bo armanca veçêkirina wan têne komkirin.

**Veçêkirina bermayan**

Di malan de bermayî bi rêkûpêkî ji hev tê cudakirin bo bermaya danhev ji bo şewtandinê, bo madeyên bi qîmet ji bo veçêkirinê û bo bermaya taybet (berhemên jehrî). Hemî navçe xwedî cihên komkirinê ne, wek hewşên karkirinê, navendên bixwegirtinê (RAZ) yan kompaniyên taybet ji bo avêtinê, ku bermayên komkirî li ba wan tên teslîmkirin: Şûşe, kaxez û karton, betlên lastîkî, madeyên lastîkî, madeyên wek qotiyên aluminium û tenekî, keskyatî, cîhazên elektrîkê, bermaya taybet wek baterî, zeyt û berhemên jehrî. Mirov dikare hin-

dek bermayên tekane wek cîhazên elektrîkê, bateriyan û betlên lastîkî li dikanan jî vegerîne. Bi vî awayî hema bêje nîvê bermayên komkirî têne veçêkirin.

### Bermayên, ku nayên veçêkirin
► [45]

Bermayên danhevê, anku ew bermaya ku mirov nikare sûdekê jê wergire, têne komkirin û li cihên şewtandinê bi şêweyekî parastî ji bo jîngehê têne şewtandin. Li dema şewtandina bermayên danhev germî û kehreba çêdibe, ku êdî têne bikaranîn. Gelekî qedexe ye, ku mirov bermayan li cihên giştî bihêle yan kombike û di sopeyên taybet yan li derve bişewtîne. Û her wiha qedexe ye, ku mirov bermayên rohn yan hişik birijîne destavê û tê re bavêje.

Salnameya avêtina bermayan li ser malpera kombendên KVA Thurgau û ZAB rê nîaşanî te dide ji bo pêzanîna rojên komkirina bermayên danhev li her navçeyekê. Tu dikarî li ser wan malperan her wiha agahdariyan ji xwe re peyda bikî, ka tu dê karibî li ku derê kîsên bermayê ji xwe re peyda bikî û ka tu dê kengî karibî wan bermayan bibî cihê komkirina bermayan. Bermaya danhev divê di kîsên bi pere yê bermayê de yê KVA Thurgau yan yên ZAB bêne komkirin, ji ber ku Kantona Thurgauyê avêtina bermayên malan di rêya vê bacê re hisab dike. Mirov divê ji bo bermayên mezin polên bacê ji xwe re bikire.

**Şêwirdariya li ser bermayê û salnameya bermayê ya pirzimanî, civanên komkirinên taybet:**
► www.kvatg.ch
► www.zab.ch



## Kultur

- ▶ [46]
- ▶ www.museen.tg.ch
- ▶ www.thurgaukultur.ch

Kantona Thurgauyê bi kulturên xwe yên berbelav û rengareng bi nav û deng e. Şopên kulturî li Kantonê pir in: Gelek burc, qesir, kavlî mîna dêr û kenîseyan û cihên îbadetê, û her wekî din jî cihên destkarî û pîşesaziyê hene. Mirov dikare li mozexaneyên Thurgauyê tev berhemên dîrokî û kulturî yên komkirî şahidên demê yên rengareng peyda bike.

Li Thurgauyê hunerê hemdemî jî geş e, wek mînak li jorên hunerî û mozexaneyan li Kreuzlingenê, Arbonê, Frauenfeldê yan li Kartause Ittingen.

Û meydana mûzîkê jî li Thurgauyê jîndar e. Navendên kulturî wek Dreispitz, Trösch û meydana Bodensee li Kreuzlingenê, Pentorama li Amriswilê yan dêra Kloster Fischingenê konsertên mûzîka klasîk û şanoyên mûzîkvanî û gelek tiştên din pêşkêş dikin. Heskiriyên mûzîka cazê didin pey bihina festîvala navdewletî ya cazê <<Gnerations>>, anku (nifiş) li Frauenfeldê. Li wê derê hem festîvala li derve ya Frauenfeldê – festîvala herî mezin ya Hip-Hopê li Europayê tê lidarxistin.

Kesên ku ji şanoyê hes dikin, dikarin wek mînak herin avahiya şanoyê ya Thurgauyê li Weinfeldê, şanoya li ser sînor li Kreuzlingenê, kargeha şanoyî Gleis 5





li Frauenfeldê yan dikarin herin serdana yekê ji wan şanoyê vekirî bikin.

**Werziş**
- ► [47]
- ► www.vtstg.ch

Li Thurgauyê nêzîkî 860 komeleyên werzişî hene. Çi ji zarokan re, çi gencan û mezinan re yan ji mirovên pîr re be: gelek çalekiyên werzişî yên berfereh hene. Tu dikarî agahdariyên berferehtir li ba nivîsîngehên tûrîzmê yên Herêma xwe, li ba Navçeya xwe yan li ba van navnîşanên li xwarê peyda bikî.

**Geriyan, hajotina biskilêt, xûşandina li ser skatê**
- ► [48]
- ► www.thurgauer-wanderwege.ch
- ► www.thurgau-bodensee.ch

Geriyan şêweyê werzişê yê herî heskirî ye li Siwêsrayê. Bi rêya vê werzişê hem mirovên temenmezin û hem genc jî bihina xwe fireh dikin û Herêmên corbecor yê Welêt nas dikin. Li Kantona Thurgauyê 1.000 kîlomêter rêyên geriyanê yê nîşankirî hene, ku bi taybet ji bo kesên geriyanhez hatine veqetandin.

Û her wekî din jî mirov dikare li Thurgauyê li ser rêyên biskilêtan, ku bi giştî 900 kîlomêteran dirêj in, li ser rêyên aram li deverên herî xweş bi biskilêt bigere û nas bike, wek mînak li ser rêya biskilêtan ya Bodensee, yekser di ber qeraxên golê re. Li Thurgauyê hem cihên xweş ji bo hajotina Inlineskatan hene. Xwe li ba Thurgau Tourismus li ser derfetên corbecor agahdar bike.







## Komele

- www.thurgaukultur.ch
- www.vtstg.ch
- www.tarjv.ch

Sê çaryekên niştecîyên Siwêsrayê ku di ser 15 salan re ne endamên komeleyekê ne yan endamên rêxistineke xêrxwazî ne. Di wan komeleyan de ew kes çalak in, yên ku bi hev re û bi şêweyekî xwebeş û ji dilê xwe dixwazin xizmetê bikin, taku

- bi hev re guh bidin wan tiştên ji wan re serincrakêş in: werziş, kultur, dema vala û hwd.
- dîtina xwe li ser mijarekê derbirînin: dayik û bavên şagirtan, koçber, mirovên pîr û hwd.
- xwe di warê civakî û aborî de çalak bikin: sendîkayên karkeran, kombendên pîşeyî, komên xwedî berjewendiyên hevbeş û hwd.

Siwêsra Welatê Kombend û Komeleyan e. Li seranserî Welêt bi hezaran e, ji wan nêzîkî çend sedek li Thurgauyê hene. Di jiyana rojane de ya Kantonê ev komele xwedan roleke serekî ne. Wek mînak kombendên werzişê, komeleyên kulturî û her wiha komeleyên koçberan hene, ku di warên corbecor û rengareng de çalak in.

Endametiya di komeleyekê ji van de ji bo hevguncîna bi jiyana Herêmê re û ji bo dirustkirina danûstandinan bi xelkên xwecih yên Thurgauyê re gelekî baş e. Ev komele ji bo hemî kesan vekirî ne. Here ser malpera înternêtê ya Navçeya xwe yan heger tu bixwazibî agahdariyên berferehtir li ser Komeleyên Herêma xwe ji xwe re peyda bikî, tu dikarî peywendiyê bi Navçeya xwe re deynî.

## Bizava xêrxwaziya giştî

- [18], [30], [49–51]
- www.benevol-jobs.ch
- www.netzwerk-asyl-tg.ch
- www.migrationsamt.tg.ch/integration

Tu dikarî di rêya bizava xêrxwazî re tevna danûstandinên xwe yên civakî berferehtir bikî û bi şêweyekî rasterast bibî hevkar ji bo sazkirina derdora xwe. Tu dikarî ji bo demeke dirêj di rêxistinan de kar bikî yan bi çalakî beşdariyê di projeyên taybet de bikî. Li Thurgauyê ▸[49] Benevol serperiştiya çalakiyên xwebexş dike. Tu dikarî xwe li ba ▸[30] Xaça Sor ya Siwêsrî jî agahdar bikî, li ba ▸[18] Caritas yan li ba ▸[50] HEKS jî. Heger tu bixwazibî alîkariya pena-

beran bikî, tu dikarî herî ba komên alîkaran yên tora Penaberiyê li Thurgauyê.

Tu dikarî lîsteyeke berhevkirî li ser çalakiyên hevguncîna civakî di warê koçberiyê/penaberiyê de li ser malpera înternêtê ya ▶[2] beşê pisporî yê kantonî ji bo hevguncînê peyda bikî.

**Dîn**

Destûrê Siwêsrayê yê Federal û destûrê Kantona Thurgauyê azadiya bîr û behweriyê diparêzin. Her kes dikare bi azadî biriyarê bistîne, ka dixwaze behwermend be yan na û ka dixwaze behweriya xwe bi kîjan dînî bîne. Ev tê wê watê, ku azadiya dînî mafekî şexsî ye, ku her kes bi azadî li gorî bîr û behweriyên xwe bi kar tîne. Rêvebiriyên Dewletê rola giring ya dêran û ya komên dînî yên din di civakê de qebûl dikin. Di rex dînê Katolîkî û Protestînî de Îslam dînê sêyemîn e di Kantonê de. Ji bilî wan hindek komên dînî yên din hene. Ev kom û civakên dînî hemî wekî Rêvebiriyên Dewletê dixwazin danûstandinên di navbera dînan de pêş de bidin û aşîtiya dînî biparêzin.

- ▶ Dêra Katolîkî ya Thurgauyê Thurgau: www.kath-tg.ch
- ▶ Dêra Încîlî ya Thurgauyê: www.evang-tg.ch
- ▶ Kombenda sîwan ya civakên Îslamî li Rojhilatê Siwêsrayê: www.digo.ch
- ▶ Yekîtiya Civakên Israylî Siwêsrî: www.swissjews.ch





### Demokrasiya rasterast

Tu demokrasiyê Cîhanê ne wekî demokrasiya Siwêsrayê piştgir e ji bo tevlîbûnê. Mafên siyasî, ku wek mafên niştîmanî jî têne bi nav kirin, gelekî berfereh in: mafê dengdanê, mafê hilbijartinê, mafê destpêşxeriyê û mafê gişepirsiyê. Gelê xwedan mafê dengdanê dikare bi vî hawî pêşniyara guherandina destûrê bike (mafê destpêşxeriyê) yan dikare qanûneke ku ji aliyê parlemento ve hatibe amadekirin, red bike (mafê gişepirsiyê). Dema ku mirov li Siwêsrayê behsa <<Serfiraziyê>> dike, mirov hingî behsa hevwelatiyên Siwêsrî dike.

Mirov mafên siyasî li ser sê astên Dewletê bi kar tîne: Asta Federal, Kantonê, Navçeyê. Salê gelek caran ji gelê Siwêsrayê tê xwestin, ku dengê xwe bide; Kanton û Navçe bi giştî dengdanên xwe li gel dengdanên Federal bi rê ve dibin. Encûmena Federal, ku Desthilata Siwêsrî ava dike, ji aliyê Parlemento ve tê hilbijartin. Parlemento ji aliyê Gel ve tê hilbijartin û ji du Encûmenan pêk tê: Encûmena Niştîmanî û Encûmena Herêman.

### Dezgehên siyasî

Ew dezgehên hatîn hilbijartin bi giştî navê <<Encûmenê>> li wan tê kirin. Erkê wan ew e, ku bifikirin, munaqeşê bikin û pêşniyaran pêşkêş bikin, ku êdî Gel dikare wan qebûl yan red bike.

### Sê astên siyasî

Salê nêzîkî çar caran ji gelê Thurgauyê tê xwestin, ku dîtina xwe li ser mijarên her sê astên siyasî bidin:

- Astê Navçeyê (wek mînak avakirina saloneke şanoyê)
- Astê Kantonê (wek mînak avakirina rêyekê li Kantonê)
- Astê Yekîtiyê (wek mînak guherandina qanûna Federal li ser tamîna kêmendamiyê)

Her serê çar salan nûnerên Parlementoyan û Desthilatan li ser astê Navçeyan, Kantonan û Federal têne hilbijartin û her wiha Dadwerên Dadgehên Herêmî jî.

| Asta siyasî | Asta Parlamentoyê | Asta Desthilatê |
| --- | --- | --- |
| Navçeyên Thurgauyê | Komcivîna Navçeyê | Encûmena Navçeyê |
| Kantona Thurgauyê | Encûmena mezin | Encûmena Desthilatê |
| Yekîtiya Siwêsrayê | Encûmena Niştimanî û Encûmena Herêmî | Encûmena Federal |

**Mafên siyasî yên kesên biyanî**
▶ [33]

Heger tu ne Hevwelatê Siwêsrî bî, te li Kantona Thurgauyê û li Navçeyên Thurgauyê mafê dengdan û hilbijartinê nîn e. Hindek Navçeyên tekane derfetê didine biyaniyan, ku tevlî komcivînên Navçeyê bibin û dengê xwe yê şêwirdarî bidin. Dêrên katolîkî di vê mijarê de haletek istisnayî ne, ji ber ku kesên biyanî dikarin daxwaziya dayîna mafê dengdanê ji xwe re bikin. Tu dikarî li dibistanan daxwaziya beşdariyê wek dengekî şêwirdarî bikî.





## Şêweyên din yên tevlîbûna siyasî
► [51]

Li gel mafê siyasî çendîn derfetên din hene, ku mirov dikare di rêya wan re tevlî jiyana giştî bibe û bi vî hawî beşdariyê di sazkirina siberoja civakê de bike. Mirov dikare wek mînak li komeleyeke taxê, li yekîtiyeke herêmî, li rêxistineke pîşeyî, li yaneke werzişê, li komisyoneke şêwirdarî yan partiyeke siyasî de kar bike.

Kesekî biyanî mezin yan biçûk jî wekî keseke/kesekî siwêsrî mafê pêşkêşkirina daxwaziyan/gazindenameyan heye. Mafê pêşkêşkirina daxwaziyan derfetê ji bo her kesekî vedike, ku bikaribe pirsan, pêşniyaran, rexnan yan gazindan ji Rêvebiriyên Dewletê re bişîne. Dibe ku ev kar bandora wî li ser biriyarên Dezgehên Dewletê hebe.

## Hevwelatîbûn
► [33]

Li Kantonê salane 800 heta 1.000 kes mafê hevwelatîbûnê werdigire û bi vî hawî dibe xwedan derfeta tevîbûna giştî ya siyasî: mafê dengdanê û mafê hilbijartinê li ser astê Navçeyê, Kantonê û Ferderalî. 12 % ji nişteciyên Siwêsrayê ji temenê 15 saliyê ve li Kantona Thurgauyê hevwelatên du Welatan e. Wergirtina mafê hevwelatîbûnê yê siwêsrî biriyareke şexsî ye û derbirîneke daxwaziyê ye. Şertê wergirtina vî mafî, hevguncîneke baş e li gel rewş û jiyana deverê, ya Kantonê û ya siwêsrî. Li Thurgauyê hebûna sertefîka astê fêrbûna zimanê elmanî B2 ji bo devikî û B1 ji bo nivîskî şertê herî kêm e ji bo wergirtina hevwelatîbûnê. Tu dikarî lîsteyekê bi navên dibistan û dezgehên kursên fêrbûna zimanê elmanî û sertefîkayan, anku bawernameyên qebûlkirî, li ser vê malpera înternêtê peyda bikî:

► www.migrationsamt.tg.ch/integration

Navçeya te jî dikare bi dilxweşî te li ser şert û mercên hevwelatîbûnê agahdar bike.

## Ev dezgehên li xwarê birêzkirî ji bo dayîna agahdariyên berferehtir li ser wan mijarên, ku ▶nemreyên wan yek bi yek di beşên belavokê de hatine nivîsandin, di bin xizmeta te de ne.

▶ [1] **Migrationsamt des Kantons Thurgau *(Rêvebiriya Koçberiyê ya Kantona Thurgauyê)***
Langfeldstrasse 53a
8510 Frauenfeld
Tel. 058 345 67 67
migrationsamt@tg.ch
www.migrationsamt.tg.ch

▶ [2] **Fachstelle Integration des Kantons Thurgau *(Beşê Pisporî ji bo hevguncînê yê Kantona Thurgauyê)***
Bahnhofplatz 65
8510 Frauenfeld
Tel. 058 345 39 88
integration.mia@tg.ch
www.migrationsamt.tg.ch/integration

▶ [3] **Kompetenzzentrum Integration Bezirk Frauenfeld *(Navenda Pisporî ji bo hevguncînê li Herêma Frauenfeldê)***
Kasernenplatz 4
8500 Frauenfeld
Tel. 052 724 56 60
agi@stadtfrauenfeld.ch
www.agi.frauenfeld.ch

▶ [4] **Kompetenzzentrum Integration Bezirk Kreuzlingen *(Navenda Pisporî ji bo hevguncînê li Herêma Kreuzlingenê)***
Marktstrasse 4, 8280 Kreuzlingen
Tel. 071 677 62 34
zeljka.blank@kreuzlingen.ch
www.kreuzlingen.ch

▶ [5] **Kompetenzzentrum Integration Bezirk Weinfelden *(Navenda Pisporî ji bo hevguncînê li Herêma Weinfeldenê)***
Pestalozzistrasse 14,
8570 Weinfelden
Tel. 071 622 04 06,
andrea.keller@koibw.ch
www.koibw.ch

▶ [6] **Kompetenzzentrum Integration Oberthurgau *(Navenda Pisporî ji bo hevguncînê li Herêma Oberthurgauyê)***
Hauptstrasse 12
9320 Arbon
Tel. 071 454 77 56
franziska.schoeni@oberthurgau.ch
www.oberthurgau.ch

▶ [7] **Fachstelle Integration Romanshorn *(Beşê Pisporî ji bo hevguncînê yê Romanshornê)***
Konsumhof 3, Postfach 36
8590 Romanshorn
Tel. 058 346 83 31
marian.brenner@romanshorn.ch
www.romanshorn.ch

▶ [8] **Fachstelle Integration Amriswil *(Beşê Pisporî ji bo hevguncînê yê Amriswilê)***
Arbonerstrasse 2
8580 Amriswil
Tel. 071 414 12 34
integrationsstelle@amriswil.ch
www.amriswil.ch

▶ [9] **Fachstelle Integration Arbon *(Beşê Pisporî ji bo hevguncînê yê Arbonê)***
Wallhallastrasse 2
9320 Arbon
Tel. 071 447 61 63
lukas.feierabend@arbon.ch
www.arbon.ch

▶ [10] **Klubschule Migros *(Dibistana Yaneyî Migros)***
Bahnhofplatz 70–72, Passage
8500 Frauenfeld
Tel. 058 712 44 50
www.klubschule.ch

▶ [11] **ARGE Integration Ostschweiz *(ARGE Hevguncîn li Rojhilatê Siwêsrayê)***
Rorschacherstrasse 1, Postfach 61
9004 St. Gallen
Tel. 0848 28 33 90
verdi@arge.ch
www.arge.ch

▶ [12] **Bibliothek der Kulturen *(Pirtûkxaneya Çandan)***
Promenadenstrasse 12
8510 Frauenfeld
info@blibliothekderkulturen.ch
www.bibliothekderkulturen.ch

▶ **[13] Mieterinnen- und Mieterverband Ostschweiz *(Kombenda Kirêciyan li Rojhilatê Siwêsrayê)***
Webergasse 21
9000 St. Gallen
Tel. 071 222 50 29
ostschweiz@mieterverband.ch
www.mieterverband.ch/mv-os.html

▶ **[14] Strassenverkehrsamt des Kantons Thurgau *(Rêvebiriya Hatûçûnê ya Kantona Thurgauyê)***
Moosweg 7a
8500 Frauenfeld
Tel. 058 345 36 36,
www.stva.tg.ch

▶ **[15] Sozialversicherungszentrum Thurgau (SVZTG) *(Navenda Tamînên Civakî ya Thurgauyê, SVZTG)***
St. Gallerstrasse 11
8501 Frauenfeld
Tel. 058 225 75 75
info@svztg.ch
www.svztg.ch

▶ **[16] Amt für Wirtschaft und Arbeit des Kantons Thurgau *(Rêvebiriya Aboriyê û kar li Kantona Thurgauyê)***
Promenadenstrasse 8
8510 Frauenfeld
awa@tg.ch
www.awa.tg.ch

▶ **[17] Sozialamt des Kantons Thurgau *(Rêvebiriya Civakî ya Kantona Thurgauyê)***
Promenadenstrasse 16
8510 Frauenfeld
Tel. 058 345 68 20
info.soa@tg.ch
www.sozialamt.tg.ch

▶ **[18] Caritas Thurgau *(Caritas Thurgau)***
Franziskusweg 3
8570 Weinfelden
Tel. 071 626 11 81
thurgau@caritas.ch
www.caritas-thurgau.ch

▶ **[19] Benefo-Stiftung *(Dezgeha Benefo)***
Zürcherstrasse 149
8500 Frauenfeld
Tel. 052 723 48 20
benefo@benefo.ch
www.benefo.ch

▶ **[20] Steuerverwaltung Thurgau *(Şehirdariya Thurgauyê)***
Schlossmühlestrasse 15
8510 Frauenfeld
Tel. 058 345 30 30
info.sv@tg.ch
www.steuerverwaltung.tg.ch

▶ **[21] Thurgauer Gewerkschaftsbund (TGGB)**
Hohenzornstrasse 4
8500 Frauenfeld
Tel: 052 720 50 15
info@tggb.ch
www.tggb.ch

▶ **[22] Eidgenössisches Büro für die Gleichstellung von Frau und Mann (EGB) *(Nivîsîngeha Yekîtiyê ji bo wekheviya jin û mêr, EGB)***
Schwarztorstrasse 51
3003 Bern
Tel. 058 462 68 43
ebg@ebg.admin.ch
www.ebg.admin.ch

▶ **[23] Eidgenössische Kommission gegen Rassismus (EKR) *(Komisiyona Yekîtiyê li dijî nijadperestiyê, EKR)***
Inselgasse 1
3003 Bern
Tel. 058 464 12 93
ekr-cfr@gs-edi.admin.ch
www.ekr.admin.ch

▶ **[24] Arbeitsinspektorat des Kantons Thurgau *(Rêvebiriya Kar ya Kantona Thurgauyê)***
Bahnhofplatz 65
8510 Frauenfeld
Tel. 058 345 56 30
arbeitsinspektorat@tg.ch
www.awa.tg.ch

▶ **[25] Perspektive Thurgau**
Schützenstrasse 15
Postfach 297
8570 Weinfelden
Tel. 071 626 02 02
info@perspektive-tg.ch
www.perspektive-tg.ch

▶ **[26] Selbsthilfe Thurgau *(Alîkariya xwe bi xwe ya Thurgauyê)***
Freiestrasse 10, Postfach 429
8570 Weinfelden
Tel. 071 620 10 00
info@selbsthilfe-tg.ch
www.selbsthilfe-tg.ch

▶ **[27] Amt für Gesundheit des Kantons Thurgau *(Rêvebiriya Tendirustiyê ya Kantona Thurgauyê)***
Promenadenstrasse 16
8510 Frauenfeld
Tel. 058 345 68 40
gesundheit@tg.ch
www.gesundheit.tg.ch

▶ **[28] Spitex Verband Thurgau**
Freiestrasse 6
8570 Weinfelden
Tel. 071 622 81 31
info@spitextg.ch
www.spitextg.ch

▶ **[29] Pro Senectute Thurgau**
Rathausstrasse 17, Postfach 292
8570 Weinfelden
Tel. 071 626 10 80
info@tg.prosenectute.ch
www.tg.prosenectute.ch

▶ **[30] Schweizerisches Rotes Kreuz Kanton Thurgau *(Xaça Sor a Siwêsrî li Kantona Thurgauyê)***
Rainweg 3
8570 Weinfelden
Tel. 071 626 50 80
geschaeftsstelle@srk-thurgau.ch
www.srk-thurgau.ch

▶ **[31] Pro Infirmis Thurgau-Schaffhausen**
Marktstrasse 8
8501 Frauenfeld
Tel. 058 775 22 35
thurgau@proinfirmis.ch
www.proinfirmis.ch

▶ **[32] Heilpädagogische Früherziehung Thurgau *(Perwerdekirina zû ya pêdagogîkiya Tedawîkirinê li Thurgauyê)***
Thundorferstrasse 3
8500 Frauenfeld
Tel. 052 722 20 17
info@hfe-tg.ch
www.hfe-tg.ch

▶ **[33] Amt für Handelsregister und Zivilstandswesen des Kantons Thurgau *(Rêvebiriya Tomarkirina Bazirganî û Dayîra Nifûsa ya Medenî li Kantona Thurgauyê)***
Bahnhofplatz 65
8510 Frauenfeld
Tel. 058 345 70 70
sekretariat.hz@tg.ch
www.hz.tg.ch

▶ **[34] HOT Homosexuelle Organisation Thurgau *(Rêxistina Hevzayendan ya Thurgauyê)***
Wilerstrasse 3
9545 Wängi
info@hot-tg.ch
www.hot-tg.ch

▶ **[35] Beratungsstelle für gewaltbetroffene Frauen Thurgau *(Cihê Şêwirdariyê li Thurgauyê ji bo jinên tûşî zordariyê bûyîn)***
Oberstadtstrasse 7, Postfach 1002
8500 Frauenfeld
Tel. 052 720 39 90
kontakt@frauenberatung-tg.ch
www.frauenberatung-tg.ch

▶ **[36] Fachstelle Häusliche Gewalt *(Beşê Pisporî yê Zordariya li nava malê de)***
Kantonspolizei Thurgau
Dunantstrasse 14
8570 Weinfelden
Tel. 052 728 24 50
fachstellehg@kapo.tg.ch
www.kapo.tg.ch

▶ **[37] Konflikt. Gewalt – Gewaltberatung für Männer, Frauen und Jugendliche (Şêwirdariya li ser Navkokiyan ji bo mêran, jinan û gencan)**
Gaswerkstrasse 15
8750 Weinfelden
Tel. 078 778 77 80
kontakt@konflikt-gewalt.ch
www.konflikt-gewalt.ch

▶ **[38] Amt für Volksschule des Kantons Thurgau *(Rêvebiriya Dibistana Gel ya Kantona Thurgauyê)***
Spannerstrasse 31
8510 Frauenfeld
Tel. 058 345 57 70
info@av.tg.ch
www.av.tg.ch

▶ **[39] Amt für Berufsbildung und Berufsberatung des Kantons Thurgau *(Rêvebiriya Xwendina Pîşeyî û Şêwirdariya Pîşeyî ya Kantona Thurgauyê)***
Grabenstrasse 5, 8510 Frauenfeld
Tel. 058 345 59 30
abb@tg.ch, www.abb.tg.ch

▶ **[40] Kontaktstelle Heimatliche Sprache und Kultur (HSK) des Kanton Thurgau *(Cihê Peywendiyê ji bo Ziman û Kulturê Welat (HSK) ya Kantona Thurgauyê)***
Amt für Volksschule
Spannerstrasse 31, 8510 Frauenfeld
Tel. 058 345 58 14
priska.reichmuth@tg.ch
www.av.tg.ch

▶ **[41] Amt für Mittel- und Hochschulen des Kantons Thurgau *(Rêvebiriya Dibistanên Navendî û Zanîngehan ya Kantona Thurgauyê)***
Grabenstrasse 11
8510 Frauenfeld
Tel. 058 345 58 30
amh@tg.ch
www.amh.tg.ch

▶ **[42] Amt für Mittel- und Hochschulen des Kantons Thurgau- Abteilung Ausbildungsbeiträge (Rêvebiriya Dibistanên Navendî û Zanîngehan ya Kantona Thurgauyê – Beşê mûçeyê karê pîşeyî)**
Grabenstrasse 11
8510 Frauenfeld
Tel. 058 345 58 38
amh@tg.ch
www.stipendien.tg.ch

▶ **[43] Thurgauisch-Schaffhauserisch-Maturitätsschule für Erwachsene *(Dibistana Bakaloriya ya Thurgauyî-Schaffhauserî ji bo mezinan)***
Neuhauserstrasse 7
8500 Frauenfeld
Tel. 058 345 51 00
administration@tsme.ch
www.tsme.ch

▶ **[44] Fachstelle Berufsabschluss für Erwachsene (BAE) *(Beşê Pisporî ji bo Bawernameyên Pîşeyî ji bo mezinan)***
Amt für Berufsbildung und Berufsberatung
Grabenstrasse 5
8510 Frauenfeld
Tel. 058 345 59 55
bae@tg.ch, www.abb.tg.ch

▶ **[45] Amt für Umwelt des Kantons Thurgau *(Rêvebiriya Jîngehê ya Kantona Thurgauyê)***
Verwaltungsgebäude
Promenadenstrasse 8
8510 Frauenfeld
Tel. 058 345 51 51
umwelt.afu@tg.ch
www.umwelt.tg.ch

▶ **[46] Kulturamt Thurgau *(Rêvebiriya Kultur ya Thurgauyê)***
Grabenstrasse 11
8510 Frauenfeld
Tel. 058 345 73 73
kulturamt@tg.ch
www.kulturamt.tg.ch

▶ **[47] Sportamt Thurgau *(Rêvebiriya Werzişê ya Thurgauyê)***
Zürcherstrasse 177
8510 Frauenfeld
Tel. 058 345 60 00
sportamt@tg.ch
www.sportamt.tg.ch

▶ **[48] Thurgau Tourismus *(RêvebiriyaTourîzmê ya Thurgauyê)***
Friedrichshafenerstrasse 55a
8590 Romanshorn
Tel. 071 531 01 31
info@thurgau-bodensee.ch
www.thurgau-bodensee.ch

▶ **[49] Benevol Thurgau *(Benevol Thurgau)***
Freiwilligenzentrum
Freiestrasse 10
8570 Weinfelden
Tel. 071 622 30 30
info@benevol-thurgau.ch
www.benevol-thurgau.ch

▶ **[50] HEKS -Hilfswerk der Evangelischen Kirchen Schweiz *(HEKS-Rêxistina Alîkariyê ya Dêrên Incîlî li Siwêsrayê)***
Regionalstelle Ostschweiz
Weinfelderstrasse 11
8580 Amriswil
Tel. 071 410 16 84
heks_ostschweiz@heks.ch
www.heks.ch

▶ **[51] Politische Parteien im Kanton Thurgau *(Partiyên Siyasî li Kantona Thurgauyê)***

▶ Christlichdemokratische Volkspartei (CVP)
*-Partiya Gel ya Mesîhî û demokrasî*
www.cvp-thurgau.ch

▶ Sozialdemokratische Partei (SP)
*-Partiya Sosiyal demokrat*
www.spthurgau.ch

▶ Freisinnig-Demokratische Partei (FDP)
*-Partiya Fikrê Azad ya demokratîk*
www.fdp-tg.ch

▶ Schweizerische Volkspartei (SVP)
*-Partiya Gel ya Siwêsrî*
www.svp-thurgau.ch

▶ Bürgerliche Demokratische Partei Schweiz (BDP)
*-Partiya Hevwelatî û demokratîk ya Siwêsrî*
www.bdp.info/tg

▶ Die Grünen
*-Kesk*
www.gruene-tg.ch

▶ Grünliberale Partei (GLP)
*-Partiya Keskên Lîberal*
www.tg.grunliberale.ch

▶ Eidgenössisch-Demokratische Union (EDU)
*-Partiya Yekîtiya demokratîk*
www.edu-tg.ch

▶ Evangelische Volkspartei (EVP)
*-Partiya Gel ya Incîlî*
www.evp-thurgau.ch


**Weşanger û Grafîk**
Rêvebiriya Koçberiyê ya Kantona Thurgauyê,
Beşê Pisporî yê Hevguncînê

**Çap**
Ströbele Kommunikation, Romanshorn

**Wêne**
Şêwirdariya Dewletê ya Kantona Thurgauyê
Thurgau Tourismus
Pixabay.com

# Nemreyên haletên Hawarê ji bo Siwêsrayê

**Hijmara Hawarê ya giştî**
(Hem bi SIM-Karta biyanî jî dibe) ..................... **112**

**Polîs** ..................................................................... **117**

**Agirkuj** (Agir, Av, Gaz) ........................................ **118**

**Hawarî/Ambulans** ...............................................**144**

**Destê alîkariyê** (Tengaviyên nefsî) .............**143**

**Navenda agahdariyan li ser madên jehrî** (Jehrîbûn) ..........................................................**145**

**Telefûna Hawarê ya zarok û gencan:** ....**147**

## Li dema rewşeke hawarî de:

- **Aram bimîne.**
- **Bibîne ka çi metirsî hene.**
- **Xwe bigihîne cihekî aram.**
- **Têkiliyê bi karmendên hawarê re bike.**
- **Alîkariyê pêşkêş bike.**